


BERBANG



6 / 1982



NAVEROK

Tırkiye serapa girtigeh e.....	3
Dı xebata çandî de ciyê Berbangê.....	6
Gringahiya têkoşina lî derveyî welat.....	9
Selam.....	11
Nivîskarê gelên tenêmayî.....	12
Helbest.....	14
Berdêlî.....	16
Mesela Kurdistanê dî pirtûka "bineciên cihanê" de.....	19
Mendalê Mamoste.....	21
Xaçerêz.....	22
Namên Xwendevanan.....	23

○

Berpirsiyar
A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan
A. M. GILLY

Raxistina Nivîsaran
SEYRAN û GULBAHAR

○

BERBANG

*Kurdish tidskrift - Utges av kur-
diska Riksförbundet - Ansvarig
utg./ redaktör A. Rıza Alan
- Layout A. M. Gilly - Sättning
Seyran och Gulbahar -*

ADRESS

*Kurdiska Riksförbundet, Sveav.
135, 113 46 Stockholm
Tel : 08 / 33 07 09*

*Prenumeration: Medlemmar
50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.*

Xwendevanan Berez,

Xwendevanên Berêz,

Me bî vê hejmarê ve şeş hejmarên sala 82' yan --ku me jî dest-
pêkê ve dabû ber xwe -- xelas kir. Ê êdî Berbang derbasi qona-
xeke nu dibe. Em hêvidar in ku dî sala 83' yan de Berbang wê
bî alikariya xwendevanan pêngavên hejatr û xurtir bavêje.

Me dî hejmara bori û ya destên we de hinek guhartinên teşe-
yi(şekli) kir. Ger lî ser teşeya kovarê rexnên we hebîn, divê hûn
wan beri hejmara yekem a 83'yan ragihinin me. Jî ber ku em dî-
xwazîn dî destpêka 83'yan de Berbangê bî teşeyeke nu bîweşi-
mîn da ku teşeyên bingehîn (wek rûpela yekem, quncikên nivî-
sarên cûrbecûr û hwd.) ên kovarê tim wek xwe bîmin.

Me nivîsara Reşo Zilan, " Kurtenivîsarek lî ser dîroka zimanê
kurdî yê nivîsandî " negihand vê hejmarê. Em hêvidar in dê
xwendevan lî me bîborin. Emê wê dî hejmara pêş de çap bikin.
Hûnê dî rûpela dawîn de ilana Înstîtuya Kurdî Lî Fransê bîxwi-
nîn. Ne pêwîst e mîrov lî ser gringahi û hêjayiya xebatên bî vi
rengî dîr û dirêj mijûl bibe. Bê guman, divê em gîş piştewaniya
vê xebatê bikin.

Ê kumukên me...

Me gelek rexne û gotinên tal bîhistin lî ser kumukên Berbangê.
Rexnên xwendevanên me dî ci de ne. Lê gelo rexnegrên ku-
mukan dîzanîn, ku em kumukên hemû tîpan bî destên xwe da-
tînin serê wan ? Seriyên bî kumuk peyde nabîn. Divê mîrov bî
her serîki ve bî çandî hejmara tîpên serbîkum, kumukan pine bî-
ke. Ê pine kîrma her kumukekî jî serîki nu yê makîna nivîsandî-
nê buhatir e. Dema ku em jî aliyê aborî de ber xwe bîbin, emê
şaşiyên kumukan jî rast bikin.

Bî silav û gramên me
BERBANG

BERBANG

*Kovara Kurdî, Xwedî : Fede-
rasyona Komelên Kurdistanê
lî Swêd. Buha : 5 Kron, Abo-
na salekê: 50 Kron, 30 DM.*

NAVNIŞAN

*Kurdiska Riksförbundet, Sve-
avägen. 135, 113 46 Stock-
holm/Sweden. Tel.08/330709
Postgiro : 64 38 80 - 8*



Yılmaz Güney

YILMAZ GÜNEY:

«TIRKIYE SERAPA GIRTİGEH E.»

"GIRTİGEHÊN KU MIROV TÊ DE NE DIKARIN CÛRBEÇÛR BIN. DIBE KU GIRTİGEHÊN CIVAKÎ, YÊN ÇANDÎ AN YÊN SIYASÎ BIN. MESELA ZILAMÊN DI "YOL" DE, GIRTİGEHEKE BI DÎWARÊN BERBIÇAV TERK DIKIN JI BO KU TÊKIV GIRTİGEHEKE BI DÎWARÊN VEŞARÎ. CIVATA PATRIARKAL, BI ZAGONÊN (QANÛN) XWE YÊN CIVAKÎ Û BI ÇANDA XWE, DI SERÊ VAN ZILAMAN DE GIRTİGEHEKE VEŞARÎ DAMEZRANDIYE. DI VI FİLMÎ DE GIRTİGEHA RASTIN, DINYA LI DERVEYÎ GIRTİGEHÊ YE. YANÎ TIRKIYE, SERAPA GIRTİGEH BI XWE YE."

"Yol", Filmê artist û rejisorê Kurd Yılmaz Güney, bi filmê Costa Gavras "Winda" re, li Cannesê xelata zêrin parve kir. "Yol" di dû serketina Cannesê re, iro, ji aliyê bi milyonan Ewropîyan ve têt temaşê kirin. Hemû radyo, televizyon û rojnamên cihanê, bi taybetî li ser filmê "Yol" û bi gelemperî li ser Y. Güney, bi xweşî û bi gelek pesnên hêja mijûl bûn. Di vê navê de, me ji xwest ku em bi Y. Güney re hevpeyvînekê bikin. Lêmixabim, me heta niha mecaleke weha bi dest nexistiye. Bi hêviya ku emê di nêzik de xwe bigihînin Y. Güney, em niha ji xwendevanên xwe re, nivisareke ku me ji hevpeyvîn û peyvên Y. Güney berhev kirîye, pêşkêş dikin. Nivisar, ji materyalên şirketa film, ji hevpeyvînan ku di "positiv", Hjm. 256, di "Le Film Français", Hjm. 1901 de derketine, ji materyalên Enstituya Filman a Swêdi, hatiye berhev kirin.

- "Yol" digel ku di girtigehê de hatiye çêkirin, ji filmên te yê dîn tekûztr e, bo çî?

Y.G. - Yek ji awantajên vi filmi ev e; ku ez karibûm di karê wi yê dawî de bêşdar bibim. Wulo tê ne gihîje ku tenê ji ber vi sedemi ew ji yê dîn çêtr e. Ez dixwazim bêjim ku ez bi can û dil xebitîm û min gelek wextê xwe dayê. Yek ji awantajên di ji ev e; ku Şerif Gören bi salan asistaniya min kiribû û dîtinên min ji nêz ve

dizatîbû. Tarik Akan ji pîştî rola xwe ya yekemin di filmê "Sürü" (kerî) de, pêngavên hêja awêtîbû. Ji aliyê dîn ve, me ji gelê Kurd, bi xêra pêşdeketina zanyariya siyasi li Kurdistanê, alikariyeke gelek mezin stend.

- Dema ku tu ji Tirkîyê hati, filmê te di kijan gehinekê de bu?

Y.G. - Kışandina film giş hazir bû.

- Ji bo ku mirov bikanibe filmeki bi vi rengi bixşine di vê dairên resmi qebûl bikin. Te çawa karibû filmeki ev çend bi ixtilaf, û di rewşa xwe ya hungê de çêki?

Y.G. - Ji bo ku mirov vê yekê têbigihê, divê mirov pêşî rewşa min a şexsi, ya li Tirkîyê têbigihê. Di vê neyêt jibir kirin, ku di dû 1964'an re serçavê (sima) min li nîk gel zaf rind têt nasin. Di dema kışandina film de, dairên resmi tum dixwestin rê li me bigirin, pê bavêjin ber me û bikin ku em dev jê berdin. Lê bi xêra dostan û bi xêra populerbûna xwe ya di nav gel de em filitîn û bi ser ketin.

- Gelê Tirkîyê ku te bi artistî dînase, karibûye filmên ku te van salên dawî bi xwe çêkriye ji bibîne; di şertên normal de temaşê wan bike?

Y.G. - Filmên min ên

dawî, bi çandi filmên ku ez di wan de xwedî-rol bûm, negihane xelkê. Gelek çaran bi tehdîdên avêtina qemberan (bombe) û hwd. dixwestin xelkê bi bîzdimin, da ku newêribin temaşê van filman bikin. Li İstebol'ê, dema ku "sürü" dilê jist, qemberekê avêtin sinemayê. 16 kes qop bûn. Sineman tenê dikaribûn di bin parastina dergevanên çekdar de filmên min rê bîdin. Her pênc bajarên mezin ne têt de, ev film li kêm bajarên dîn hatin belav kirin. Xwediyê sineman dîtirsîyan.

- Te van çirokên çihê - çihê ji mijûliyên hevalên xwe yê girtigehê derani?

Y.G. - Di destpêkê de, me navê proja vi filmi danibû "İzin". Li Tirkîyê du cejnên gewrê yê islami hene; dawîya meha rojiyê, Ramazanê, û 17'ê cotmehê. Min ji hemû hevalên xwe yê girtigehê re salx da, ku dema dîçim iznê, hemû serpehatiyên xwe û heval û hogrên xwe not bikin. Hinek bi 2 rûpelan û hinek ji bi 10 rûpelan vegeyiran. Yê ku nîkaribûn binivîsîn ji

bı dev gotın. Ez ji van not û peyvay derketim rê û min serpehatiyên li iznê yên 11 girtiyên hevalên xwe hılbijart. Serpehatiyên nu hatın, min wan ji tevi yên dın kır. Film, an bı gotineke rastır manus, dı orijinalê xwe de şeş saet dirêj bû. Min dixwest çirokeke dirêj çekim. Lê ji ber gelek pingarên ku me ji seri ve nıkarıbû bıdıya, em mecbûr man, ji 11 serpehatiyay daketın 5'an. Film ji realitê, ji jıyana girtiyay û ji tecrube û zanına min a derheq cıvata Tırkiyê û mirovên ve cıvatê çêbûye. Ev film, senteza van tıştan gış e.

— Manus, dı destpêka kışandına film de wulo bı detay bû ku Şerif Gören dıkarıbû tenê li gor wê bıxibite, an marjınalek ji bo afirandına wi bı xwe ji hebû?

Y.G. — Dı manusa ku min nıvisandıbû de, her tışt gelek bı detay (teferuat) bû, sahne-bı-sahne. Lê marjınala -para- afirandınê ji bo rejisör tım dımıne. Yezdan dızanın, lê ez bıxwe dibêjum Göran para xwe bı kar anı û lew re film hat xelat kırın. Her gav, dema ku ez bı rejisöreki re dıxebıtım, ez dıtınên xwe, nêrina xwe ya li film û mesaja ku dıxwazım bı wi filmi bıgıhınım xelkê jêre dıyar dıkım. Lê ev, bı tu awayi, para çêkeriya wi bı xwe jê nastıne.

— Tu her tım behsa rejima faşist a Tırkiyê dıki, lê film bı xwe li ser jıyana siyasi ya Tırkiyê, ya iro gelek hındık dısekıne, li aliyê dın, li jêmaya (miras) axlaq rexne digre?

Y.G. — Rast e. Daxwaza min ne ew bû, ku jıyana siyasi li Tırkiya iro raxım ber çavan. Armanca vi filmi, ji bini ve ne ew e; ne dıyar kırına rejima fa-

şist a leşkeri, ya Tırkiyê ye. Lê ev rejima faşist tım li pişt perde ye. Leşker her gav û li her deri hazır û nazır in. Carına nerm xuya dıkın, lê dısa ji dıkarım miroveki bêgune dı nav sanıyekê de bêı ku çavên xwe bıneqının bıkujın. Dıvê ev dijberi ji bêt şanıdan. Ev leşker, hıncıqandına axlaqı, jêmaya derebegi û çandı, her roj dı jıyana mirovan de vedıxuyên. Min dıxwest şanıdım ku, reva ji van gışan, bı hev re, çıqas dijwar e. Tu alternatıv, tu rê nıne.

— Salên girtıgehê li ser jıyana te rêçeki çawa hıştıne?

Y.G. — Beri her tıştı, girtıgehê damezrana (muesese) tadekariyê ye. Ji bo ker kırın, kor kırın û ji bızav xıstına mirovan e. Dıxwazın bı vi awayi mirovan bıguhêrin, lê dıkarê bıbe ciki wulo; ku mirov li wê der dıpije, dıbe xwedıyê zanın û şexsiyetê. Eger mirov bêhêvi nebe dıkarê bıbe xwedıyê tecrubeke gelek bı rümet. Ji bo girtıyeki tıştê dijwar, parastına sıhata wi ya fıziqi, psiki û ronakbiri ye. Pênç sal li girtıgehê mayın, li ser mirov şopeki kur dıhêle. Her çend ez bıxwazım muaf xuya bıkıım ji, bê guman ez ne ıstına me. Ez ji, wek her kesi êşıya me. Lê mirov nızane de ew ber bı derve ve xwe çawa şanı bıde.

— Bêı nıvisandına manusa (Senaryo) film, te weki dın dı girtıgehê de çı dıkar?

Y.G. — Min gelek tışt nıvisand. Bêı manusa film du roman, sê çirok û çar nıvisarên siyasi. Hemû ji çap bın. Jıyana min a li girtıgehê têkoşıneke bê westan bû. Ez beşdari gelek serihaldana bım. Tu

taheti ne bû.

— Baweriya te ya siyasi nıha çıye?

Y.G. — Ya grıng dı Marxısmê de metod e. Ji bo me ji têtbiq kırına vi metodi li hoyên taybeti yên Tırkiyê grıng e. Bı dıtına min, rêyên şoreşgeri yên ku welatên dın dane ber xwe, ne pêwıst e ku ji bo welatê me ji rast bın. Dıvê mirov ji bo welatê xwe li rêyek dın bıgere. Ez nıha nedı tu grûbeke siyasi de me. Filmên min hem xıtabi mirovên xwenda, hım ji xıtabi xelkê dıkın. Peywendıyeke min ê duali bı xelkê re heye. Filmên min xelkê dıxın nav tevgerê, xelk ji min bı pêş ve dıxın. Pıraniya filmên min piştgrıya têkoşına gelê min, ya ji bo azadiyê dıkın. Ez bawer ım, dı rojeki wek iro de, ku welatê min dı bı nırê diktatoriyek e faşist de ye, de filmê "Yol" ji roleke weha bılıze.

Derheq zordestiyê, zordestiya li ser jınan, girtıgehê, diwarên veşari, siyaset û senat ji bersivên Y. Güney ev bın:

LI SER ZORDESTIYÊ

DI "Yol" de, min xwest bı gelemperi zordestiyê şanıdım. Dıvê mirov barê tadekariyê gış li sistemê nebıne. Zordesti tenê ji sistemê nayê; danüstendınên mirovan (ku grêdayi şertên jıyana wan a cıvaki û abori ne) ji zordestiyê dıafirının. Bêinsafi ji perçala feodal a welatên rojava ma ye. Ez li vêder, behsa tore, axlaq, teşeyên (şekıl) jıyanê û etıkeke kevnare dıkım. Eger mirov van herdu tebayên zordestiyê bıgıhıne hev, mirov de tadekariya ku bı gelemperi dıbe têtbiqê. Ji aliyekê ve tadekariya ku mirov li hev dıkıın û ji aliyeki dın ve, tadekariya ku kırdayeti ji jor ve li mirovan dıke. Ev herdu formên tadekariyê, du parçên sistemê ne. Ú dıvê mirov sistemê yek parçe bıbine.

LI SER GIRTİGEHÊ

Girtıgehên ku mirov tê de ne, dıkarım cırbecır bın. Dıbe ku girtıgehên cıvaki, yên çandı an yên siyasi bın. Mesela zılamên dı "Yol" de, girtıgeheke bı diwarên berbiçav terk dıkın, ji bo ku têkır girtıgeheke bı diwarên veşari.





Civata patriarkal, bî zagonên (qanûn) xwe yê n cîvaki û bî çanda xwe, dî serê van zîlamên de girtigeheke veşari damezrandiye. Dî vi filmi de girtigeheha rastin, dînya lî derveyi girtigehê ye. Yani Tîrkiye, serapa girtigehi bî xwe ye.

LI SER DIWARÊN VEŞARI

Awayê fıkrandîna mirov, dîkare jî mirov re bibe wek girtigehê. Mirov tenê dema ku dibe xwedî zanyari, dîkare xwe jî nîrê tore û adetan rîzgar bike. Em dîkarî Seyit Ali, yek jî zîlamên dî film de, wek misal bigrîn. Pîreka wi çûye ser cîyê zîlamên dî. Problemê wi gîş ev e. HEke cezaki ne-

dê, careke dî nîyê wi nade ku derkeve nav cîvatê û ev jê re dibe rûreşîyeke gran. Dîkarîbû rîya berdanê jî bîde ber xwe. Lê wulo nekîr. Û girtigeha axlaqê cîvatê wi daqurtand. Misala dî jî, Mewlûde e. Jî seri ve gelek zagonan datîne pêşîya dergîstîya xwe; jî lîxwekirîna wê, hata rabûn û rûniştîna wê. Yani wê bî rêzîleke (zîncir) jî qedexan grêdîde. Ev qedexe, dîwarên girtigehêke berbiçav ava dîkî.

LI SER JINAN

Lî Tîrkiyê, tadekariyê lî ser hemû jînan ne wek hev e. Jînen gundîyan û taxên xîzan ên bajarî,

zêdetîr dî bin tadekariyêke aborîde ne. Mesela jî-neke gundî, karên nav malê dîke, cot dîke, lî mîr û zaroyên xwe mîze dîke. Bî kurtî, karûbarên nav-malê gîş lî ser pîştî wê ne. Ev jî nî, dî bin şertên herî gran û xerab de dîjî. Mafê xwedî gotî bûnê jî tê de, derheq jî-yana wê de tu mafên wê nînin. Dema xama dibe û tê ber zewacê, malbata wê kî bîxwaze; wê bî wî re dîzewîcîne. Jînen dewlemendan jî, jî bîndestîyê para xwe dîstînin. Ew jî jî "tuxmê (cîns) çêls" tînen hesabîdî. Dîgel dewlemendîya xwe, ne azad î. Lew re, lî wan jî bî çavê mulkîyetê tît nîherîn.

LI SER SEN'AT Û SIYASETÊ

Ez mîroveke sîyasî me, lî dîtîna mî nî a lî ser sen'at pîçek cuda ye. Ez film, wek navgîna (wesîte) raber kîrîna rastîyeke teorîk nabinîm. Ez lî dîjî filmên ku lî ser sloganên tînen ava kîrîn û dîbîn ma-kîna propagandê, me. Dîgel vê yekê, ez bawer îm, sen'atê mî nî bî naverokê (muhtewa) sîyasî ve dagîrtî ye û lî ser xelkê tesîreke gran çêdîke. Jî ber vê yekê, ez deydarê zîmanê xwe yê sen'atkari me.

JI BO PÊŞKETINA ÇANDA ME KOVARA BERBANG XEBATEKE ÇAWA DIKARE BIDE LI PÊŞIYA XWE ?

Rohat

BI SED SALAN LI SER GELÊ KURD ZORDESTIKE KEVNEPEREST, ŞOVENİST Û NİJADPEREST AJOTIN. BI HIŞKÎ ZIMAN, ÇAND Û HUNERMENDIYA GELÊ KURD HATIYE QEDEXEKIRIN. HÊZÊN KOLONIALİST HERTIM DIXWAZIN ÇANDA GELÊ ME BIHELİNIN, PIRANIYA GEL BITEVİZİNIN Û MÊJİYÊ MIROVÊN NEZAN BIŞON. LI HER ÇAR BEŞÊN (PERÇÊN) KURDISTANÊ VÊ POLİTIKA ASİMILASYON Û NASIYONALİST ZIRAREKE PIR GIRAN GIHANDIYE ÇAND Û HUNERMENDIYA GELÊ ME.

Ji aliyê din, di warê pêşketin û gulvedana çanda gel da, niştmanperwer (welathêz), ronakbir û zaneyên Kurd roleke aktif listine. Ji bo Holêrakirina tari û nezaniyê, di nav refên gel da, ew bi sed salan xebitine, li diji hemû tehrên (cûre) zordestiyê wan tu wext stûyên xwe nîmz nekirine. Ew bûne dijminê zordestiya netewî (millî), ji bo parastina mafên gelê Kurd wan gelek caran ji, xwe avêtine nav agir; Şewata şoresê. Hin caran hatine girtin, lêdan teda ditinê û hin caran ji bi destê dijmin hatine kuştin. Bi kurtebirî ji warê pêşketina çanda gelê Kurd da, rêberî û pêşengiya ronakbirên Kurd pîr tîştên hêja û giranbuha gihandiye li bilûmbûna doza gelê me.

Iro li Ewrûpayê bi destê komel rêxistin û partiyên (hîzb) Kurdistanê di warê karên çand û hunermendiyê da virda - wêda, kêma - hindik xebateke baş têt ajotin. Li ser rûpelên gelek rojname û kovarên Kurdi di vi wari da pîr nîvisar diweşin û çap dibin. Ji vana yek ji kovara BERBANG' e.

Kovara Berbang, çawa tê zanin, dengê Komelên Kurdên Swêdê ye, paşî çend rêxistinên Kurd li Swêdê ghiştine hev, dengê wan hin ji zêtar û xurt destpêkir û belav bû. Kovara Berbang,

bo vê yekê dikare di warê berevkirin, çapkirin û pêştabirina çanda me da rolekê fireh û mezin bilize. Disa dikare pîr efrandinên nîviskar, senetkar û hunermendan bihîne xwendevanên xwe. Di navbera Berbang û xwendevanên wê da pîreke rast, peywendiyên xurt û bendên cure - cure dikarin pêkbên.

Em di vê benda (gotar) xwe da dixwazin bi firehi xal bi xal (deq, madde) li ser beşên (par, bîr) çanda Kurdi bisekinin. Xwendevanên kovara ê dikarin van peşneyarên me hin ji pêşta bîbin, hinek tîştan li ser da zêdekin, an ji bawerî - ramanên xwe pêvakin.

KARÊN LI SER ZIMANÊ KURDÎ

Kovara Berbang û hemû xwendevanên wê pêvist e (hewce) bi hev ra diji zordestiyên li ser zimanê Kurdi derkevin, van zordestiyan protesto bikin. Çawa kal - bavên me ji gotine ; "Ziman Kilita Dîlan e ", vê rastiyê mirov nikare veşêre an ji bavêje hêlekê. Bo vê yekê pêştabirina zimanê Kurdi karekî pîr girîng e li pêşiya me sekîniye.

Zelalî, ziravî û dewlemendiya zimanê me pêvist e bi karên cure - cure va derkeve ronahiyê. Bi Kurdi dengkirin (peyivîn) û nîvisandin pêvist e guhdari

û bala xwendevanên bîxşîne ser xwe.

Hînbûn û hinkirina (fêrkirin) zimanê Kurdi li ser bîgehên rast lazîm e bîmeşîn, mamosteyên jêhati û materyalên baş dikarin van xebatan hin ji pêşta bîbin.

Bo vê yekê kovara Berbang, bi xwendevanên xwe va tevayî dikare li ser vê pîrsê xebateke demdirêj ji xwe ra amade bike.

KARÊN LI SER EDEBIYATA KURDÎ

Edebiyata Kurdi edebiyateke kevn e û diçe digehê kûraya salan. Lê ev edebiyat, nîviskarên Kurd, navên efrandinên wan û babeta (naveroke) van efrandinan iro baş nayê zanin. Edebiyata Kurdi di çî rewşê da ye û li ser edebiyata Kurdi çî xebat dajon ? Kovara Berbang ji hêlekê da dikare bersivên van pîrsan bihîne xwendevanên, ji hêla din da, di nav rûpelên xwe da dikare ciheki bîde nîvisarên xwendevanên li ser van pîrsan. Bi vi tehrî kovara Berbang û xwendevanên wê pêvist e mlên xwe bîdin hev, ji bo bedewiya edebiyata Kurdi pêşta bîbin, bîdin naskirin û hebûna wê bîparêzin. Bi van xalên jêrin va ev kara dikare bigehê menzileke serfiraz û kêrhati :

- Edebiyata kevnar - klasîk
- Edebiyata Nûjen modern li her çar perçên Kurdistanê
- Pêşketina edebiyata Kurdên Sovyetê
- Xebatên di vê babetê da li derwayî welat

KARÊN LI SER ZARGOTINA KURDÎ

Zargotina (folklor devki) me pîr dewlemend, xemlandi û nexşên tenk va hatiye nîrandin. Zargotina iro, li ser zar - zimanê gelê me da digere û gelê me pîr tîştên hêja li ser zargotina me zane. Pîraniya van nîmûneyên zargotina me hê nehatine berevkirin, çapkîrîna û dermeketîna ronahiyê. Bo vê yekê kovara Berbangê û xwendevanên wê bi hev ra di vi wari da kareki fîreh û kûr dîkarin bîdîna li peşîya xwe. Ev yeke ji aliyê dîna berbîrsiyarîke mezîna e li ser mîlên her welatparêzêki Kurdî. Dîji zordestî, nijadperestî û şovîniya dijîmîna, pêvist e em zargotina xwe biparêzîna û pêşta bîdîna.

Kovara Berbang, dîkare karên li ser zargotina Kurdî hatîna nivîsandîna beş - beş çap bike, ji aliyê dîna da xwendevanên kovarê ji pêvistîna zargotina me ya di nav gel da berev bîkîna, bînvîsîna û li ser navnîşana kovarê bîşîna.

Mîrov dîkare van karan wek jêr nîşan bîde û ji hev veqetîna ;

a) Destanên Kurdî (wek Zembîlîfîroş, Memê Alan, Sîyabend û Xecê)

b) Kîlam - Stranên Kurdî :

- Stranên dîlan, bengîtî û hubê
- Stranên şeran, mîrani û dîrokê
- Stranên şînê
- Stranên govendê
- Stranên olperest (dîni)

c) Mesele û Metelokên Kurdî : Gelê me carîna vana bî "Bendên Pêşîyan" carîna ji bî "Gotîne Kal - Bavan" nav dîke.

d) Çîrokên gel

e) Jêderxîstînok (tîştînok, mamîk)

f) Henek - laqirdî-pêkenî

g) Serpêhatîyên (hîkyat) Kurdî

h) Hevbendîyên Kurdî (hevokên ku di nav xwe da mînekê dîna vedîşîrîna) û herweki dîna...

Ev karên folklorîk sertaca hebûna gelê me û rûmeta çanda me ne. Hêzên kolonyalist van efrandînen gelê me li ser çanda xwe dîhesbîna û dîxwazîna vê zargotina me bîghîna zargotina xwe, bîhelîna. Bo vê yekê, hemû kesên welatparêz, şorîşvan û hemû kesên dîlpak pêvistîna li dîji vê çavberdanê bî xurtî rawestîna.

KARÊN LI SER SAZBENDIYA KURDÎ

Kovara Berbang, bî tehreki baş û fîre dîkare sazbandîya Kurdî bîde naskîrîna, li ser sazbandîyê gelek tîştîna bîweşîna. Xebatên sazband, dengbêj û muzîkvanên me çawa li her çar beşên Kurdîstanê, wusan ji li dervayî welat pîr xweş hatîna naskîrîna. Ji aliyê dîna, li gelek cîhan komên (koro) kîlam û meçamên Kurdî saz dîbîna û nîmûneyên sazbandîya me pêşkêşî gel dîkîna. Bî notan va nivîsandîna kîlam, stran, meçam û sîrûtên Kurdî zêde dîbîna. Dîsa di warê berevkîrîna van perçan da pîr kar tîna pêkanîna.

Kovara Berbang, di nav çanda me da wusan ji guhdarîke germin ji dîkare bîde li ser sazbandîya (muzîka) gel. Bî taybetî di warê berevkîrîna perçeyên sazbandîyê da kovar dîkare roleke pîr mezîna bîlîze. Kovara Berbang, ji aliyê

dîna da pêvist e ; bî sazband, dengbêj û muzîkvanên Kurdî va hevra carîna kar bike.

KARÊN LI SER ETNOGRAFYA

Kovara Berbang, dîkare dest bavêje hêla etnografîya Kurdî. Li ser erf - edet, kevneşopî û rabûn - rûnîştîna gelê Kurdî pêvist e karîna pêkîna û vê yekê di nav rûpelên xwe da ji xwendevanên xwe ra bîde naskîrîna. Di vi wari da ev pîrsên jêrîna pêvist e zelal bîdîna ;

a) Navên xwarîna - vexwarîna Kurdîna û tehrên wan li Kurdîstanê çî ne ?

b) Kînc - lîbasên Kurdîna, ew bî çî va tîna çêkîrîna ?

c) Hacetên destan û Fonksîyonên wan

d) Reças û listîkên Kurdîna, tîyatroya gel

e) Bawerî, raman û psikologîya Kurdîna li ser jîyîna

Bî kurtî kovara Berbang, di hemû warên çanda Kurdî da him û bîngêhên çandêke pêşkêti pêvist e bavêje. Dîji çanda hêzên feodal û kevneperest dîsa lazîm e kovara Berbangê şer bike. Çanda gundîyan, karkeran û hemû hêzên zehmetkêş iro li dîji hêzên kolonyalist bejn dîde û gulvedîde. Bo vê yekê hêzên kevneperest çanda me qedexe dîkîna û nahêlîna ew pêşta here. Çanda me, iro, bûye çek - silahek di destê gelê me da hemberî kolonyalistan. Bona vê ji kovara Berbang bî xwendevanên xwe va tevayî di warê pêşkêti çanda Kurdî da pêvist e gavên xwe hin ji pêt, xurt û bî lez bavêjîna.

Dûmahîka "Berdêlî" ye

Mahmûd,

— De naxwe em weha lev bîna û mîradê zarokan bî cîh bîkîna. Qasîm, ji kêfa dilê xwe rabû û destê xwe dirêjî Mahmûd kir.

— Ji îro pê de keça min Wesîla bûka te ye, Mahmûd.

— Keça min jî bûka te ye lo Qasîmo.

Paş vê levhatîna, ew li ser hazîrîkîna û guhastîna jî peyivîna, li ser xelat û mesrefan lev hatîna. Paş, ku Mahmûd û Mîremê gîhan malê berî ku ew rûnîna, Xeco bî heyecan jî dayka xwe pîrsî.

— Daye, we xwest, hûn li hev

hatîna ?

— Erê keça min, em lev hatîna. Ji îro pê de çîza wan bûka me ye û tu jî ya wan î. Hûn berdêlî ne. Xwedê çî gotîbe weha jî dîbe.

Dema Xeco bersîva dîya xwe bîhîst rengêki sor kete ser de. Bî dengêki şermoyî,

— Daye, min lawîk nedîtî ye. Ez nîzanîm çî mexloqê xwedê ye ?

Mîremê li çîza xwe temaşê kir û bî dengêki jî xwe razî,

— Qîza min ne baş e ku zaro hember bîyara bav û dê dîdîna derkevîna. Bahwerke Zekî xortekî bîlînd û pîrlevhatî ye.

Keçîk jî weke gulekê ye.


Xeco, çîza reben, di dilê xwe de navê zavê û Wesîla û gotîna dayka xwe tîkarîna. "Zekî, xortekî bejn bîlînd û pîr levhatî ye." "Wesîla, weke gulekê ye." Dînya çî tîne serê meriv. Ji ezîmandîna her du zavan çendek paş de berdêlî hatîna guhastîna. Di eynî rojê de her du bûk li hespan sîwar kîrîna û yek ber bî Helexê ya dîna ber bî Zînewlê çû.

Ji wê rojê û paş de bûk û zava gîhan "mîradê" xwe û dest bî jîyanek nuh kîrîna. Dilê her du xezûr û xesûyê jî xweş

bû bî vê yekê. Xeyrîya jî di roja guhestîna xwîşka xwe de bî cilîkên nuh ku bavê wê jê re kîrbûn diçû wî aliyê gund û dîhat. Da xelk bîbîna ku cilîkên wê xweşîkîna. Dera ku Xeyrîya nêzîk nedîbû, cîhê ku ku melayê gund lî runîştîbû. Lewra, Xeyrîya jî melê çet hez ne dîkir. Melê jî herweha jê hez ne dîkir, ku wê bîya wî ne dîkir û diçû dîbîstana li gund. Wî dîxwest ku Xeyrîya here dersên Quranê lî çî mîxabe ye ku ew razî nebû û ne diçû dersên Quranê. Dîbîstana bû cîhê ku Xeyrîya jê hez dîkir.

**ԳՐԱԿԱՆ ԳԻՐԲԸ
ՆԱՅԱՍՏԱՆՈՒՄ
1930-1980 թ.**

DI SALA 1981'AN DA, DİROKZAN CELİLÊ CELİL LI SER PIRTÛKÊN KURDİ BİBLOG-RAFIYEK AMADE KIR. DI BİBLOG-RAFIYÊ DE NAVÊN PIRTÛKEN KURDİ HATINE RÊZ KIRIN. EV PIRTÛKANA ÇAWA NIVİSKAR DIDE NIŞAN, DI NAVBERA SÂLÊN 1930 - 1980'AN DA LI ERMENİSTANÊ HATINE ÇAPKIRIN.



Издания курдских писателей на армянском языке

Ev bibliografiya hêja bi zimanê Kurdi, Rûsi û bi zimanê Ermeni hatiye amade kirin. Dî bibliografiyê da, navên 300 pirtûkên Kurdi cih girtine.

Paşi şoreşa Oktobré, çawa tê zanin, beşeke Kurdên Sovyetê jî ghiştin azadiya xwe. Kurdên Sovyet, di hemû warên jiyinê da gelek serfiraziyên mezînan pêkanîn. Ew di warê çand, sinet û hunermendiyê da pîr pêş ketin. Gelek nivîskar, helbestvan, zane, lêgêrvan û kesên navdar ghiştin. Bi destên wan gelek pirtûk bi Kurdi û bi zimanên gelên cînar va hatin çapkirin. Ev bibliografiya Kurdi jî yek ji wan e.

Dema ku mirov li bibliografiyê mêze dike hemû cureyên edebiyatê Kurdi tê da dibine, wek navên romanên, çirok, serhati (hikyat), listikên tiyatroyê, izgeriyên (lêkolan) zanisti û gelek bere-

vokên helbestvanên Kurd.

Bi rasti, ev pirtûka, ji bo wan kesên ku dixwazin li ser Kurdan serê xwe bêsinin, bixebitin, pirtûkeke zor hêja ye.

GRINGAHIYA TÊKOŞINA LI DERUAYI WELAT



Zinarê Xamo

Em di vê nivîsara xwe da dixwazin, li ser xebat û têkoşina li dervayî welatango ya Ewrûpayê bisekinin. Ji ber ku piraniya hêzên şoreşger li Ewrûpayê hatine ser hev û gengaziyên (îmkanên) van welatan jî, ji hemû welatên din bê-tir e.

Wek em hemû jî dizanin, ev serên du salan e ku cuntake xwin-mêj, dijminê gel û faşîst li Tirkiyê dest daye ser kirdayetiyê. Di van du salên borî de cuntayê, li ser gelên Kurd û Tirk teroreke bê sînor û hov da domandin. Neheqî, lêdan û kuştin, bû perçak ji jiyana gelê me ya rojane. Heta nika hêzên cuntayê, gelek caran gund û bajarên Kurdistanê bi rojan kirin bin hesargê. Li pîrr deran, mal xera kirin, gund wêran kirin. Bi sed hezaran kesên welatparêz, şoreşger û pêşverû dîl (esir) girtin. Bi rojan kotek kirin û di pê ra jî avêtin bin kilitê. Wisa bû ku êdî li Kurdistanê girtîgehên nu ava kirin. An jî çîşlên leşkerî kirin girtîgeh; bê yên ku nu çê dikin. Di girtîgehan de jî lêdanê bi sedan mirov seqet bûn. Bi vê hîtiyê jî qîra xwe nanîn, (pê nehatin serî) mirov bi saxî şewitandin. (wek tê zanîn di

girtîgeha Dîyarbekirê da hêzên faşîst çar kes şewitandin). Li serê çol û çepalan, bi sedan keç û xort gulebaran kirin. Hema em dikarin bibêjin, hêzên mêtîngehkar li Kurdistanê derketin nêçîra mirovên pêşverû, welatperwer û şoreşger. Xwindin, nivîsandin, axaftinango hemû mafên demokratîk û mirovî bi zorên sunguyan ji navê hate rakirin. Heta bigihê axaftina zimanê me jî qedexekirin, ji bona wê ferman weşandin. Li xwe kirina kincan, çêkirina bi hev ra gerandin, wê çawa bibe, ji bona wan biryarên fermî girtin. Li hember vê hovîtiyê, ke dengê xwebilind kir û serê xwe ne tewand, bi kêmasî zindan kirin. Van mînakîyan û kirinên cuntayê em karin hin jî dirêj bikin. Lê em bawer in ku, ev ne hewce ye. Bi hindikayî be jî, êdî gelên cihanê û hêzên aşîtxwaz jî kirinên cuntayê haydar bûne û dizanin gelên me di bin çî merçên dijwar de ne. Lê bila ev ne wê manê ku em şikyan û êdî tişteki em bikin ne maye.

Ji ber van êriş û hovîtiya cuntayê ku me li jor rêz kiribûn, gelek kesên welatparêz û şoreşger mecbûr man ku derkevin Ewrûpayê an jî hin welatên

din. Vê şarederiyê, hin gelş û hin vatîni jî bixwe ra anî.

CÛNTA FAŞÎST NAXWAZE GE- LÊN CÎHANÊ BI HOVÎTIYA WAN BÎHESE

Wek me li jor jî gotibû, cuntayê di van du salên borî da gelek zirar da gelên me na û hemû hêzên şoreşger. Ji aliyê din jî hemû tişt qedexekir ku bîr û raya giştî (awira gelemperî) ya cihanê jê haydar ne be. Ji xwe hemû kovar, rojname, yên pêşverû tavilê qedexekirin, yên demokrat jî xistin bin sansorê. Radyo, TV û rojnamên burjûwa jî, gor emr û daxwaza generalan weşan kirin. Û xwestin gelên cihanê bixapînin, rastiyê jî wan veşêrin. Cûnta jî baş dizane ku piştgiriya navnetewî gelek girîng e.

Şoreşgerên Kurd û Tirk jî, ji bo qezenc (sitendin) kirina vê piştgiriyê, gor gengaziyên (îmkan) xwe xebat kirin. Her çiqas ev xebat ne wek xwestina me be jî, lê cardin cî pê li cuntayê te ng kir. Lewra generalên NATO yê wek li hundir bi darê zorê nehiştin bi girseyî kes li hemberî wan derê, bi vî rengî xwestin li Ewrûpayê jî tu deng derneyê.

Ji bona pêk anîna van armancan gelekî li ber halê xwe dan. Bi hezaran ve sîxurên (ajan muxbîr) xwe şandin welatên Ewropayê, ku di der heqê tevgerên derva da agahdar bibin û ya din jî belbî bi vî hawî hin kesên karker karibin bi-tirsinin, ji têkoşînê dûrxin.

JÎ BO TÊKOŞÎNA ME PIŞTGIŖIYA GELEŖN CÎHANÊ GELEK PÊWÎST E.

Rast e, têkoşîna li hember cûntayê divê li hundir welêt bête dayin. Xebat di nav karkeran de, di nav gundiyan de, di nav xwendevanan de divê li hundir bê kirin. Ya giring û hîmî ev e; Ji ber ku yê textê cûntayê serûbinî bikin van hêzanandin. Lê li aliyê din, xebata derva jî ji mer divê. Divê em tu carî vê xebatê biçûk ne binin û lêva xwe jê ra hilnekin. Em bixwazin an ne xwazin, bi dilê me be an ne bi dilê me be, em bi hezaran ve ji welatê xwe şareder bûne û li Ewropayê dijîn. Ya din jî be me, bi hezaran ve karker û xwendevanên Kurd û Tirk van welatan dijîn. Ji bona hêzên şoreşgêr û xebata wan ya li hember cûntayê, ev gengaziyeke, ev gengaziyeke mezin e. Di mercên îroyîn da ev yek hîn jî girîngtir e.

Divê em, hemû hêzên pêşverû û şoreşgêr, bîr û raya giştî ya cîhanê ji lêdan û kuştinên cûntayê haydar bikin. Dema ev tune be, alikariya navnetewî jî, ji xwe ber na ye stendin. Ger ku em di vî warî da xebatê sist bikin û têkoşînek bi rikoyî ne dîn, em ê nikaribin bi serkevin. Ne tiştekî hindike ku em karibin li welatên Ewropayê alikariya sed hezaran bistînin û li dijî vê cûnta gelkuj wan bidin meşandin. Her meşek ku bi girseyî li Ewropayê tê pêk anin, divê baş bête zanîn, wek şirmaçêke li nav çavê Evrenê faşîst keve.

Ma gelo ku ne ev piştgirî û alikariya bîr û raya giştî ya cîhanî ba, wê cûnta hîn gelkuj, hîn xwînrej ne ba? Ev hêzên cîhanê yê dij faşîzmê ne li gel me ba na, me bi hêsayî kari bû halên hin girtîyan fêr bibin? Ku em bi serê xwe tenê bûyana, me karibû, mercên datgehên gerandîna (îdara) urfî bi gelên cîhanê bida nîşan dan. Mirov kare van pirsana hîn jî pirr bike. Lê dema em viya dibêjin, em naxwazin hemû tiştî bi vî alikari û piştgiriyê ve girêdin. Di vî warî da girîngiya hêzên şoreşgêr bê şik e.

TÊKOŞÎN DIVÊ BÎ PROGRAM BE

Ne bes di têkoşîna li dijî cûntayê da di hemû warî da divê xebat û têkoşîn

bi serûber, bi program be. Dema ev yek tune be, serkevtin dijwar dibe.

Ev yek, di xebata me ya Ewropa, ya li hember cûntayê de jî wisa ye. Ya din jî, divê em baş bizanibin, em ê bi kîjan azinê (metod) û bi çi hawayî herin ba gelê van walatan. Dema ku em viya rast ne peyitînin, wê demê fam kirina wan î me jî wê dijwar bibe. Ji ber van sedaman jî divê xebata me bi program be û hin armac bêne peyitandin. Ger wisa be, wê xebata me hîn bêtir fêkî bide. Gor bûyeran tevger danîn, xebat kirin ne tişkî dirist e. Divê programek me mehane, salane hebe. Bi kêmasî, ji bona rojên pêşîn divê ev bête kirin.

PERÇEBÛNA ME ZÎRARÊ DÎDE TÊKOŞÎNÊ

Geleşek me şoreşgêrên Kurdan din jî, ne liserhev bûna me ye. Ev perçebûn, têkoşîn û xebata me ya li Ewropayê bê hêz dibe. Dibe sebebên hin tengesiyan, hin tevlihevîyan. Gelek caran, dema alikari û piştgirî ji hin hêz û kesên pêşverû, democrat hatiye xwestin, ji me ra gotine "em nizanin alikariyê bi we ra bikin, divê hun hêzên xwe bikin yek. Hun berî her tiştî di nabêna xwe da yek bin" u.h.w. Ma gelo em karibin bêjin, evana daxwazên neheqîn, para rastiye ji bin di van gotinan de tune ye? Dema em karibin, di bin kêmasî hin waran de bîn ba hev û bi hev ra bimeşin, wê demê em ê jî îro hîn bêtir bi kêr bîn. Ev yek her çiqas ne hêsa be jî, lê divê ji bona bişaftina vê gelê xebat bê kirin.

PROPAGANDA DIVÊ LI SER HÎMÊ RASTIYÊ BÊ KIRIN

Terora li welatê me tê domandin bi rastî bê sînor e. Azinê ku cûnta li welatê me pêk tîne, azinên Mûsolînî û Hîtlerên faşîst in. Ev tiştekî eşkere ye, berbi çav ê. Divê em van kirinên cûnta faşîst yek bi yek eşkere bikin, gelên cîhanê jê haydar bikin. Ev vatiniyek me dîrokî ye. Tu gotina me ji vê xebatê ra tune ye. Xebatek wisa divê bê westan bête kirin-û tu carî jî sist ne be. Lê ev xebat û têkoşîn divê li ser hîmê rastiye be, lê ne yê zêde kirin. Dema wisa bê kirin, em ê hemû jê bibînin. Ya din jî hewcedariya şoreşgeran ji vî ra tune ye jî. Hewcedariya me ji rastiye ra heye, em ê rastiye bibêjin. Dibe ku bête gotin, ev propaganda ye, ne rast be jî an hinek lê zêde kirin çi pê va heye? Gor dtîna me, ev bersiv ne di çî da ye û ne rast e jî: 1) di demak kurt da

bi kêrî me bê jî, lê di demek dirêj da wê zîrarê bigêhîne têkoşîna me, 2) hin tiştin ne rast derkevin holê, carek din wê li bûyerên rast jî bi şik bê nirîn, 3) wê hin qulp tekevin destê cûntayê ku karibe xwe pê bi parêze, 4) wê bibe sebebê bê tesîr mana raporên hin kes û komelên navnetewî. Em bawer in, ev egeriyên (gerekçe, sebeb) ku me li jor rêz kir in, ne wisa biçûk in. Ku mirov li ser hûr û kûr ne ponij e an jî pê tinazê xwe bike. Ku em jêhatî bin, tiştên ku cûnta li welatê me dike, em karibin bi tevayî ji gelên cîhanê ra eşkere bikin, ma gelo ne bes î me ye? Lê em bawer in ku me hin hovîtiya cûntayê ji sedî deh bi bîr û raya (awira gelemperî) cîhanê ya giştî ne da ye qebûl kirin. Bêtirin em ji hev ra dibêjin û bi zimanê xwe di nivîsînin. Gelên cîhanê, komelên navnetewî jê haydar na bin. Tiştên jê haydar dibin jî tiştên pirr hindikin. Bi rastî ku em harin ba wan, neheqî, lêdan û kuştinên cûntayê ji wan ra bibêjin, (bê zêde kirin, tiştên bûyî) li me guhdarî dikin. Gelek hêz û kes ji dil jî alikariya me bikin. Lê sed mixabin em tune ne, ma ne divê berî hemû tiştî em hebin.

Baweriya me ev e ku, divê dema em doza tiştekî li cûntayê dikin, bi kêmasî mirov karibe van bûyerên bi çî û war bike. Dema em wan bi çî û war ne kin, dibê ku cardin li me guhdarî bikin, lê wê ji me bawer ne kin. Piştî ku ev rewş wisa ye, divê tiştên em dibêjin, ne yê pûç kirin. Divê di destên me da hin delîl hebin, em karibin hin tiştan nîşanî wan bidin. Ma gelo heta îro kîjan partî an jî grûbek Kurd, li ser van lêdan û kuştinên cûntayê raporek hazir kirin û pêşkêşî Komela Efüyê an jî ya Koma Miletan beşê Komisyona mafên mirovahî kirin? Qasî ku em pê dizanin, ne bû ye. Hin tişt bûbin jî ne bes in, pirr kêr in. Berî hemû tiştî divê pêwendiyên me bi welatê me ra xurt bin. An em nikaribin vî vatiniyê bi çî binin. Li Kurdistanê bûyerên dibin, qetliamên tên kirin, tavilê gelên cîhanê jê haydar bikin. Hemûyan wek raporên bi zimanê Ewropayî (İnglizî, Elmanî, Fransî) biweşînin. Bûyera îro dibe, piştî salekê çal ne kin. Divê em jî wek gelê El-Salwador, wek gelê Şîlî karibin piştgirî û alikariya sed hezaran bistînin. Vatiniyên bingehîn:

a) xwe disiplinê bikin, b) fedekar bin, c) di xebatê da ne du-dil bin, d) baweriya me bi me hebe, e) bîr fire bin, zû ranebin ser tapana. Tiştekî din girîng jî gelo em di karin çi bikin? Ango gor



qeweta xwe vatinîyê hilgirin ser milê xwe.

Tiştê ku em ê karibin bikin, em xwe lê rakşînin. Ji bo têkoşînek hîn bi hêztir, em xebat bikin.

Xwepêşandaneki Federasyoni Kurd le Swêd, dij be sefaretî dewlete dagirekani Kurdistan.

QANATÊ KURDO

HELBESTVANEK JI KURDISTANA IRAQÊ SELAM

Selam neviyê şêxê gundê Azêbanêye li topraxa Sulêmanîyê, kurê şêx Ahmedê. Li sala 1892 ji dayka xwe bûye. Bavê wî li ber destê derebeg Mehemed paşa dixebitî. Li pêşiyê ew li gundê Azêbanêda li cem şêxan li mekteba gundda hîn bûye, paşê li Sulêmanîyê hîn bûye. Li paşî şerê dunyayê yê sala 1914 Selam dikeve nav şerê azadbûna millet. Li destpêka sala 1920 li nav eskerê hukumdarê Kurdistana Iraqêda bû, li pêşiyê heta sala 1955 li diwana hukmeta Iraqêda qulix dikir. Dewletê gelek cara ew ji şeherekî dişande şeherekî din ser qulixê. Sala 1955 ew ji qulixê derket. Sala 1959 li Sulêmanîyê çûye rehmêtê.

Edebyatnasê navdar, Refîq Hîlmî li kitêba xweda ya bi navê "Tarîxa edebiyata kurd" nivîsiye. "Selam gelek tengî û çelama dinyayê ditiye, gelek rojêd gran hatne ser, lema ji zûva porê serê wî sipî bûye."

Li sala 1920 Selam dest bi nivîsandina şêran kirîye, ewî rind erebî, farsî, kurdî zanibû. Şêrêd wî p'iranî yêd derheq h'al-h'ewal, jîyîna xelqê, derheq negbetî û bindestîya milletê kurd hatne nivîsandnê, nivî pêşberî îngilîzê zevtkar û muftexurê nav welat hatne gotnê. Bîr û bawera wî ew bû, ku rojekê milletê ji bin destê dijmin derkeve, serbest be û ber bi riya bextewarî here.

Li şêra xwe "K'izîna derdê cotkar" da ewî nivîsiye.

.....
*Bi vir û derew, bi lûla tîfing,
 Av û dest û çîya bûne xîşt û xol,
 Bi zikekî t'êrim, bi sed ziki birçî,
 Bê beş bûm ji rencê can, mil û qol,
 Eva henesa singê min tê der û dor,
 Heta azad nebim, nadme xwedê gula sor*

.....
*Cotkar û law û koma kirêkaran
 Wê rêkê ji vî hafîra bibînin,
 Komele saz kin, ber bi azadiye herin,
 Şêx û axayê k'edxur ji nav xwe derînin.*

Maruf Xeznedar dinivise, ku "Selam rind zimanê farsî zanibû, ewî bi ezber "Şah-nama" Firdewusî dixwend, şêrêd Omer Xayam t'ercimey ser zimanê kurdî kirne û gelek çîrok û serhatî bi zimanê dayka xwe nivîsiye". Lê sed h'eyf, heta nika hemû nivîsarêd wî kom ne kirne û li berhevokêda çap ne kirne. Her bi tenê li sala 1958-da diwana wî bijartî li Kerkûkê çap bû.

Em hîvdarin, ku wextê diwana hemû nivîsarêd Selam bêne çapkirinê û edebyatnasê kurd karibin pêva mijûl bibin û nivîsarêd baş derheq nivîsarêd wîda binivîsin.

NIVISKARÊ GELEN TENÊMAYÎ :

G. G. MARQUEZ

M. Ferzand Baran



G.G.MARQUEZ

Gelo kê heta Gabriel Garcia Marquez binivisine, derheqê Macondo û çiroka wi de tiştekan dîzanîbû? Îro bî milyonan meriv Macondo û çiroka wi dizane. Îro bî milyonan meriv trajediya, drama, tenêbûna Macondo dîzanîn. Macondo iro, êdi ne tenê gundek piçûk li Amerika Latîni ya bextreş e. Macondo iro quncîkek li Afrika reş an stariyek li Hindû Çîni an jî kozîkeki pêşmerga li Kurdistanê ye. Ango li seranserê cihanê dereki, ku li wir meriv trajediyek, tenêbûyînek dijîn. Dereki ku çavên zarokan bî hêvi, lê zîkê wan birçi ye. Dereki ku rûyê jînan bî ken lê dilê wan bî şîn e. Dereki ku simbêlên mêran merd lê eyniya wan qermeçî ye. Dereki ku pir û kal di bin barên tenêmayî de westiyayî ne. Macondo wêder e.

Macondo iro ev e. Yadigara Marquez ev e jî merivan re. Marquez bî romana xwe ya "sedsal jî tenêbûnê" ve cihanê re Macondoyeki wusa yadigar kir.

"Sedsal jî tenêbûnê" çiroka gundekî piçûk û merivên wi ye. Çiroka malbata Buendia ye. Çiroka mêrxasê gel general Aurelia ku ketiye sed şeran lê hemû ya jî wînda kirîye ye.

Îro bî alîkariya Marquez, meriv

li hemû derên cihanê dî "Sedsal jî tenêbûnê" de çiroka xwe jî, trajediya xwe jî dixwinîn. Sûretê jî xwe jî dî romanê de dibînin. Ev tiştekan hîndîk nîne.

Pêkvanê ev romana giranbîha Gabriel Garcia Marquez isal, 1982 xelata Nobel ya edebî(wêjeyî) stand.

XELATA NOBEL

Akademiya Swêd, isal jî bo xelata Nobel ya edebî G.G. Marquez helbijart. Xelata Nobel her sal dî beşên ekonomî, tîbî, zanîyari, aşîti û edebî de tê dayîn. Kesên ku dî warên ev beşan de xebatek xuyayî û hêja kirîne tenê helbijartî. Enstituyên ev xelatana didî, gelek kevnar in. Xelat, jî 1901 vir ve tê dayîn.

Jî bo xelata isal, gelek nivîskarên bî nav û deng hatîbûn pêşniyar kirî. Bese jî Amerika Latîni gelek nivîskarên hêja dî lista Akademîya Swêd de bûn. Wek mîsal, kalê hosta Jorge Luis Borges,

Mario Vargas Llosa, Julio Cortazar, Carlos Drummond, Juan Carlos Onetti jî, dî listê de bûn. Marquez, dî nav ev hemû nivîskarên jir de bû yekem û xelatê stand.

Akademiya Swêd, dî helbijartîna Marquez de wek pîvana xwe ev tiştên jêrin jî cihanê re belav kir:

"Edebîyata(wêjeya) Amerika Latîni jî kevn de ye, jîndariyek hêja nişan dîde û rolek gelek hêja dîleyze dî jîyana kulturî ya iro de. Gelek bawerî û tore bî hev re ne. Kultura geli, stran û destanên devî, sûretên kevn jî kultura bîlînd ya sorîkan(indian), tesîrên barokîya spanî, tesîrên surreailîzma ewrûpî û modernîzm... ev hemû bî hev re avayîyek jîndar pêk tînin, ku Garcia Marquez û hozanên Amerika Spanî şewqa xwe jî wir digrin..."

Lê ev pîvan bese bî serê xwe hêjayî û dewlemendiya kultura Amerika Latîni nişan nade. Jî ber ku Amerika Latîni jî sed salan vir ve bîndest e.

BINDESTIYA AMERIKA LATINI Û KULTUR

Dî 1492 de Kristof Kolomb bê zanin cihaneknuh dit, keşf kir. Lê belê, gelên cihana nuh ji, bî hatîna Kristof Kolomb û hevalbendên wi, cara yeki bindestiyê dîtî.

Pîştî K.Kolomb, yê nî dî ku li dî zêr, baharad û keda belaş bûn, hatî. Bî tank, top, şûr derew û fenên xwe ve hatî. Pîştî demek kî têgîhiştî, ku ciyê hatîne ne buhiştî baharadê Hindistan e. Lê êdî carek hatîbûn. Û wusa man li wir...

Wê demê navendiya Kastilya de zmanê dihat, peyvandmê spanyoli bû. Helbest, destan, çîrok, dirok û perwerdeyî bî wi zmanê dihat nîvisandî. Spanyolî dî wê demê de populer bû.

Merivên cihana nuh ji cara yekî bî hatîna Kristof Kolomb û hevalbendên wi ev, ew zmanê "ecêp" naskîrî. Demek piştî re êdî merivên navxweyî yê nî cihana nuh dest bî peyvandîna wi zmanê "ecêp" kirîbûn jî. Û dema 1541 de hevalbendê Kolomb, Alvaro Nunez xwe gihand Paraguayê, navxweyîyên Guarani, wi bî spanyoli pîroz kirî. Êdî dî sedsalî XVI'a de, dî pîraniya Amerika Latîni de spanyoli dihat peyvandî.

Bî vi awayî biyani, dî gel tank, top û derewên xwe, zman, tore û kultura xwe jî anî. Navxweyîyên Amerika Latîni bindest ketîbûn. Neçar û bê hêz bûn. Dî gel dewlemendiyên wan; zman, kultur, tora wan jî, jî dest diçû. Xweşî û hêjayîyên Tlaxcalteca, Aztek, Inka wek berfa ber royê dihelîya.

Pîştî spanyolan, jî derên dî yê nî Ewrûpê jî "biyani" hatî. Ewa na jî yê nî xwe anî.

Dawîya dawî, navxweyîyên Amerika Latîni yê nî reben ketî rewşek wusa, ku êdî ne kifş bû ew kinî, çî kes mî. Wê rewşê kalê bawerîya "Amerika Latîni ya aza" Simon Bolivar wusa xuya dîda:

"gelo em kî ne? Rewşa me,

rewşek gelek taybetî ye. Em ne ewrûpayî ne, ne jî êdî navxweyî nî... Dayîka me hemûya yek e. Lê bavên me cûrbecûr in. Xwîn û cihatî nî ewana çîhê ye. Ev yek, dî hêjayîya kultura me de graniyek mezin e...."

Latin Amerikaiyên reben dî bî mîzîna Ewrûpê de mabûn êdî. Lî hêlek Spanya, hêla dî de Ewrûpa. Pozîtiwîzma Fransî, ulî-literatuzma Îngîlîzî û pragmatîzma Amerika Başûr jî jî şîkeft û deştên Inka û Aztekên reben derbaz bûn.

Lê-wek her derî- dî Amerika Latîni de jî ronakbîrên wê hever-

da (qîta) reben, dîxwestî xweser bî. Gelek tîş t jî serperwerdeyên xwe fêrbûbûn. Lê êdî-wek her carî-dîxwestî bî xwe jî hebî. Xwe jî pêkbinî, avabîkî, bêjî, bînivîsî û- ya herî grîng-fêrkî, nişan bîdî ku tîştên ew bêjî jî henî.

Û her weha rûpelek teze dî diroka Amerika Latîni de vebû. Kubai Jose Martî bî avayîyên xwe ve nişan da ku tîştên ew bêjî jî henî. Armanc, dî nav bawerî û kulturên cûrbecûr de xweyîbûn bû. Bahoza Kulturî ya Amerika Latîni wusa geşbû. Wusa avabû



kulturek granbaha, hêja. Ji xwin, xwidan, kozmopiliti û bîndestiyê qesrek zêrin avabû. Û wusa Ramon Lopez Velarde(meksikai), Cesar Vallejo(Perûi) û hozanê mezin, merivê mezin Pablo Neruda(şilii) derket.

MARQUEZ...MARQUEZ...

Iro ji, Gabriel Garcia Marquez di şopa pêşiyên xwe de dimeşe. Iro, ala bahozê ya qesra zêrin di destê Marquez, Octavio Paz, Jorge Luis Borges u yê nîm de ye. Ango, Marquez kurê qesra zêrin, bahoza tenêmayiya ye. Ew ji ji kahniya ked, xwidan û hêrs e. Dijminê kedxwara, hevalê belengaza ye. Ew, rebenan, bi zmanê wana dîwîsine, xuya dide, nişan dide. wi, 4-7 Îlon'ê, li Kuba'yê civina ronakbirên Amerîka Latîni de, bi navên hemû ronakbirên wê heverdayê wusa di got:

"Îr o, di vê demê de, ku A-

merîka Yekgirtî(USA) carek di nîvê dîwazê Amerîka me bîdestxe, wek xwe bikêş dîvê em ronakbir ji wezîfa xwe binî ci û li ba gelê xwe bin û diji bîndestiyê şer bikin."

Belê, Nobela isal, iro di destê şerwanê kahniya xwidanê de ye. Marquez ê kolombiyayî wek nivîskar, wek xuyadar di stîla xwe de ji gelek aza ye. Ew dîzane bo azadî nivîsandin, bese bi azabûna dîkare bike. Ew bo azadîyê dîwîsine, lê bêla ku dîr û dirêj behsa azadîyê bike. Ciyê azadîyê, ew behsa merivên tenêmayî, merivên, ku ji kahniya xwidanê ne, dike. Cihêbûna politîka û edebîyad(wêje)'ê baş dîzane ew. Di nivîsarên xwe de tîştan tev lîhev nake. Xuyayîyek hêsan nade ber xwendevanên xwe. Xwendevanên xwe fêrê zexeliyê nake. Bernade, xwendevan bese xwendevan be.. Xwendevan ji digre dike nav drama merivên xwe. Xwendevan ji, ê di dibe yek ji çî-

riskên rîka neheqiyê.

Marquez, ne tenê behsa bîndesta dike. Her waha serdest ji ciyên xwe digrin ba wi. Serdesta digre, bi wan ve diçe kûriyên dirokê. An ji wan digre dibe borsa New Yorkê ya iro. Ewana digerin. Ji bo xwendevan bigihîne qurma neheqiyê. Marquez serdestên navxweyî ji birvenake. Ewana ji digre dibe seyranê. Bi ewana ve ji dileyze. Di "Payîza Patrik" de xwendevan ciyê tucarek fetbaz (wek di "sedsal ji tenêbûnê" de) icar diktatorekî kevnar û mêji jîhevketî dibîne.

Marquez bo merivan dîwîsine. Ji bo wi, meriv esas e. Ji ber vi ji bûngeha nivîsarên wi meriv e. Ji merivan mozaîkeki hezar rengî (wek kultura xwe) derdixe û disa yadigarê merivan dike.

Ji ber vê jî iro, meriv li seranserê cihanê, bi taybetî yê nîm ji kahniya xwidanê ne, qedrê Marquez digrin.

HELBEST

JÎ BO XEBATKARÊN KURD LI DERWAY KURDISTANÊ

Bê nav

Ber çend salan em dîlşa bûn
Li gundekî serê çiya bûn.
Gayê me mur, me ker kir cot,
Bavê me mur, me rez firot.

Ez ketim rê hatim bajêr,
Rojek birçî û rojek têr,
Min dit paqr qe nabe zêr.

Teng bû li serê min cihan,
Çûm Konsulosa Aleman,
Îstî xwar kir weki sê wîyan,
Vîza dan min pê du salan.

Iroj dijim li Berlinê,
Feran dişom bi makinê,
Zivistanê û havînê.

Ji bo me dehan yek xani,
Kesek derdê nî me nezane,
Rojên me tev ax û keser,

Ev çî hale xudayê ser ?

Çima li me belav bû pergâl ?
Bo çî em venegerîyan mal ?
Xwelî li serê me be heval.

Bese em ketin şûna kund,
Werin em vegezin li gund,
Hevra rakin dangan bîlind,
Welat bikin azad û rind.

Tu guh bide min ey bira,
Ji tere bêjum şora pîra,
Pirka min rehmetî digot,
Her ku bavo dihat ji cot ;
"Lawê min bixwe vi nani,
Nan pivaz li Kurdistanê,
Ez wan nadim bi cihanê."

Hevalno jina me reşe,
Dengê defê ji dîrve xweşe.

ÇIMA ÇIMA

Bê kes Hêvî .

Min bi qîrîn bang da.
Dengê min hat birandîr.
Min bi zû ka gav avê t.
Gavên min hat gerandin.
Nîzam çima, çima, çima.
Em mane bîndest.
Bra tu rabe wek ba.
Gavên xwe bavê zû ka.
Piyê xwe hilweşîne, bi tîlî îşaretke.
Dijminê xwe beyan ke.
Lo lo çima, çima, çima.
Em mane bîndest.
Wek şêrê gurçîkhesîn.
Li ser çiya tu raze.
Li jêr û jor bibeze.
Qîrîn kî xweş bavêje.
Bêje çima, çima, çima.
Em mane bîndest.
Here ser çema Ferat.
Bê nêzîk bûye şefaq.
Mizgînî xweş bîdîyê.
Bişîn heyran Mehebbad.
Bêje rabin, rabin, rabin.
Em mane bîndest.

JI ZMANÊ ÇARINAN

KULMEK EVIN III

XIII

Îro, roj roja dilo ye.
Ne çahpikên melûl yê n xêşimiyê
Ne ji sixurên zane yê n traliyê
henm iro
Îro, dilo di wê, dê bo wê biji

XIV

Were berfa şîrîm were
Tu roja şevê n tari
Hevala dilên pak i
Wê ji bigre û were

XV

Dî şeva bê deng û tari de
Hesreta ew lêvên ku
Carek li ba min bûn,
Giran û bi jan e disa...

XVI

Riya bî huşta evinê
Yek caran di dilopek zelal ya avê
Yek caran ji, di dengê bîlbîla
dîlşa de ye
Ez dê bikevîm rê rojek

XVII

Disa tenê
Disa li dîr
Disa bî nefesên te ve
Te dinivîsinim

XVIII

Îro, bî pênc gulên sor
Pênc namên destana me hat nivîsin
Bî pênc kewên sîpi rê dikim.
Bigre ewana...



M. Ferzend Baran

HERDU HOSTÊ CÎHANÊ

Herdu hostê cîhane
Pir karkirin xebitîn
Karkêr bi hevra rabû
Dewlemendî perpitîn

Hêza bi çûk gir kirin
Li hanberî zor destan
Hilwaşandin çare gir
Bijîn karkêrên cîhan

Ser bilindî û pir giran
Divê çekim pir biran
Bi qîrîn û bi hawar
Bandikim te karkêran

Bi ramanî herim ser
Cîhan tev bike seyîran
Sînge xwe bidim gulan
Ku bistînim Kurdistan

Roj û şevan bikim kar
Gundîyan bidim dorê xwe
Em karkêrênê- Şoreşger ?
Xebate bikim dest xwe ?

Duxwaza me WEK - HEVÎ
Feqr gundîyan li dor me
Hemû Ala sor rakin
Sîstem dibe A me bi xwe

Feqr Ahmed

EVÎNA MÎN WELET

Evîna min yeke gelek delale
Cihê wê asêye bi dirî û dahle
Bendwariya mine bi kêre havale
Min bihistî pir nexweşe bê hale

Mîna şemalê ye mîna ye find
Nale nala wêye li bajêr û gund

Dibêje min ka tê kingê bibî rind
Li nav çiya li zinarên pir bilind;

Roj li min nadê ez tim bi şevim
Demsal û dewranin ez mîna hevîm
Destên xwe dirêj ke de nekevîm
Li benda teme ji ber te ez nerevîm

Rêya te asiye lê li pey teme
Bi çar benda li dora te keleme
Geliyên kûr li hêla teyi din çeme
Dilê te ber şabe disa ez heme

Siyabend

BERDÊLI

Derwêş Ferho

Di bin kela germa havî-
nê de Mahmûd û Mêremê be-
rê xwe dabûne gundê
lê. Ew diçûn ku bi xêr keça
Qêsim ji kurê xwe re bixwa-
zin. Nêta wan jî "ku xwedê
emir bide" di nêzik de guhas-
tina wê ye. Mahmûd, bi şewra
Mele Nûrî, çasidek ji Qêsim re
şiyandibû û bersiv jî wergir-
tibû.

Boxçika Mêremê li piştâ
wê, li pey zilamê xwe ye. Nê-
zikê çar-pênç gavan jî

Mahmûd dîr e. Ev adeta dar
û doran e ku jin jî hirmeta
mêrê xwe li pey wî dimîne.

Ji dema derketina rê û heta
nêzikê gundê Zînewlê, sê an
çar caran Mahmûd li pey xwe
temaşê kir û bi Mêremê re
peyivî. Her car jî pirsên kurt
dikirin û dîsa li ber xwe di-
nêrt. Wekî din serê wî di ber
de, destên wî li pey, seq seqê
ji tizbihan tîne. Ew nizane ku
ne Mêremê li pey e an na.
Yanî, serê xwe jê naêşîne.

Mêremê jî, keçika ku wê jî
kurê xwe re xwazin, bi "tifa-
qa xwedê", di bîra wê de û li
pey mêrê xwe diçe. Wê di se-
rê xwe de hezar reng û wêne
çêdikirin. "Gelo keçik eşqî
kar e, ew dê qedrê min
xeswa xwe bigre an na?" Dî-
sa wê jî xwe re digot "çima
ne eşqî kar be, ew çima qedrê
min nagire? Ma çey min qed-
rê xeswa xwe nedigirt ku ew
yê min negire?" Lê dîsa ê-
minayîya wê jî van gotinên
xwe re netanî û şiphe jî xwe
re çêdikirin. "Eger ew jî me
re ne qenc be, ez dizanim bê
ew çawa qenc dibe. Çend ku-
tilkan deynim ber mele Nûrî
û nivîstekê jê re bidime nivî-
sin. Hinga ber xwe bê ar
bike."

Paş ku Têlxwe li ber eyni-
kê ediland xwe berda nav
gund. Di dil xwe de roj roja
wi bû. De û bavê wî li ser rêya
Zînewlê ku yekê jê re bixwa-
zin û wi bikin zava. Hema bê-
je ku ew jî niha ve xwe zava
dibîne. Ji bo vê yekê jî kiras û
pantorê ku xalê wî ji Edenê
jêre anîbûn li xwe kiribû. Da
xelk bêje ku "zava xweşik e û
levhatî ye."

Xeco, ji kêfa ku wê yekê jî
kekê we re xwazin karê malê
bi lez dike û dilê wê xweş e.

Demê Mahmûd û Mêremê
ketin gundê Zînewlê berê xwe
rast û rê dane mala Qêsim. Di
nava sikakên gund de kêmkê



xuya bûn. Yên ku li kar bûn ji xwe li derê gund bûn û yên din jî ji germê xwe kişandi-bûn hindurwên xwe. Heqê wan jî hebû. Li ber wê germa rojê, meriv karbû hêkan li ser pişta gê bibirêje.

Dema ku kurê Qesim ji devê derî dît ku du kes ber bi mala wan tên bangî bavê xwe kir.

— Yabo, va du kes hatin vira. Qasim li ser nimêja xwe a rûvro bû. Wî nimêja xwe xira nekir, lewra guneh bû. Zekî, dîsa bangî bavê xwe kir û pêre jî kete hinduru. Dît ku bavê wî nimêja xwe dike dengê xwe birrî û dîsa derket devê derî ku xweşhatina mêhvanan bike.

Mahmûd,

— Birazî, bavê te li mal e?

Zekî,

— Belê, keremkin hinduru, bavê min li ser nimêja xwe ye.

Mahmûd,

— Allahwekîl rast e, hema bêje nimêja min jî li min dibuhure. Pêş ku ez rûnim, nimêja xwe bikim. Ka birazî peşik av da ez destnimêja xwe bigirim. Qasim derket devê derî, dît ku Mahmûd û Mêremê ne mêhvan.

— Ehlen wesehlen, werin keremkin hinduru.

Paş xweşhatinan, nimêj û diayên wan cihê xwe xweş kirin ku rûnin. Berî ku rûnin, wesîla çend doşek ji vayên tenik ji wan re danîn erdê ku li ser rûnin. Mahmûd runişt û got,

— Bi rastî rêvaniya di bin vê germê de meriv ji hal dixe.

Pek be çi germ e.


Qasim,

— Bahwerke rast e, tu dibê isal cehneme ye lo?

Li Wesîla nerî û got,

— Keçanî ka firavînkê ji me re hazir ke. Apê te Mahmûd û jinapa te Mêremê hem pîr westiya ne û hem jî birçî ne niha?

Gava Qasim weha got, Wesîla rabû ku here xwarinê hazir bike. Wê ji hatina van "mêh-



vanan" tê deranibû ku dê wê bixwazin. Lewra berî çend rojan gotina xwestina wê hatibû ber guhên wê.

Mêremê, ji dema hatinê hinduru û heta hinga çavên xwe ji Wesîla dûr ne kiribûn. Her tim, bēyî ku Wesîla tê bēne der di bin çavan de lê temaşe dikir, çûn û hatina wê di serê xwe de dipîva. Keliya Wesîla rabû û derket ji

Mêremê lê temaşe kir. Di dilê xwe de, "ku xwedê his bike, tu bûka min î, qîza min."

Heta keliya xwarin hate hinduru, Mahmûd û Qasim ji vî alî û wî alî axiftin. Mêremê jî car carna bi Zekî re peyv kûr dikirin, lê dema ku hinek tişt li ser Wesîla dihatin guhên wê peyvên xwe qut dikirin û li wan dihesiya. Yan jî bi çûn û hatina Wesîla peyvên xwe

dibirîn.

Wesîla,

— Jinapê, ji kerema xwe were oda din ku tu jî xwarina xwe bixwî.

Xwarin hazir bûwibû û wextê danina sifrê hatibû. Heçî zilam, li ser sifrekê û heçî jin jî li ser sifrekê de xwarina xwe bixwin. Mêremê ji cihê xwe rabû û ber bi deriyê oda din meşî.

— Va ez hatim qîza min.

Ew rewş bi kêfa Mêremê bû. Lewra wê dixwest rû hember rû çend peyvan bi Wesîla re bike. Bi ketina hindiruyê din re Mêremê dest bi peyvan kir.

— Qîza min, ez pîr bûm, di rê de bi zorê li pey apê te dihatim. Ka ew xortanî, ku jinapa te bi tajîyên nêçîrê re baz dida... Haa aha, xwedê miradê dilê te bike qîza min, bi rastî ez birçî bûwime û rengê xwarina te xweş tê.

Wesîla her du sifrê di qedera vexwarina qedehik av de danin û ew ezimandin ser sifrê. Wextê ku sifrê hazir bûn Mêremê bangî Wesîla ji kir ku bi hev re bixwin. Lê Wesîla ne dixwest ku li cem û di hemberê wê de bixwe.

— Na jinapê, tu bixwe, noşican be, ez tîr im.

Mêremê,

— De were qîza min were, sebra min nayê ku ez bi tenê bixwim. Were ji jinapa xwe fedî me ke. Bê tifaq di nêzik de nêta me heye ku em dilanê bikin bixêr. Qismetê xwedê şanî me kirî û dayiye me em nikarin dev jê berdin. Îro jî em ji mal ketin ser rê û hatin ku wi qismetê ji bavê te bixwazin.

Dema Mêremê ev gotin got teqînî ket ser dilê Wesîla. Êdî rast e ku ew ji bo wê hatine, xwazgîn ew in. Di şiphên xwe de ne xelet e. Lê ne wê kurik dîtî ye û ne kurik ew dîtî ye. Di dile xwe de got: "Wey li mala bavê min be, ez dilşewitiya reben, ezê çawa bikim?" Birçîbûna ku hebû

jî nema û hinavên wê tev di yek deqçe de tijî derd bûn. Ji dera ku runiştî rabû û hêdî hêdî çû ber bi devê derî de. Lê berê ku derkeve derê li Mêremê vejeriya û got,
— Jinapê, tu bixwe, ezê herim hinek dew ji sîtilê binim.

Hê wê berê xwe ji jinapa xwe ne guhertibû Xeyriya derî vekir û bi kêf kete hindiru. Haya wê ji hatina mêhvanan tunebû. Hê di serê sibehê de nan û nivîşkê xwe xistibû destê xwe û xwe berdabû nava gund. Ji hînga ve niha tê mal. Keçikê jî û xwin şêrîn bû ew. Temenê wê ji nûhve dibû heşt sal. Wek hemî hevalên xwe diçû dibistana li gund. Sala bihurî ket sala siyemîn û li hêviya vebûna dibistanê ye ku diisa here nava hevalên xwe, li mamostanê xwe guhdarî bike û bi hevra bileyizin. Wesîla,

— Xeyriya, xuham binêr jinapa me hatî ye. Here destên wê, xweş hatina wê bike. Xeyriya, bi fehtî çû destê Mêremê û bi dengê nerm û nizm xweşhatina wê kir.
— Wey xwedê temenê te dirêj bike qîza min a xweşik. Maşelleh çi keçikê şêrîn e. Wey la min biqurbanê...

Paş kêlikê, hem Mêremê û hem Mahmûd, Qêsim û Zekî firavîna xwe xwaribûn û diisa pêla xwe dabûne balgih û zembelişên pey xwe. Her yek ji wan qedehêk ji dewê qerisî li ber wan e, cixare jî di destê Qêsim de ye. Bêhneke xweş jî titinê dihat. Hebe nebe titina çaxax e ku Qêsim dikêşa.

Mahmûd, pêwistiya gotina armanca hatina xwe bike, paş çend peyvan gotin anî ser armanca xwe û got,

— De vêca ku tu izna me bide, emê daxwaza xwe ji we re bêjin.

Qêsim,

— Kerem bike, eger ez dax-

waza we karibim bi cî bikim, ser seran û ser çavan.

— Bi izna xwedê û qewlê pêxember, em hatine ku keçika te ji kurê xwe re bixwazin. Lawik va bû ye 19 salî, paş çend salan wê bê qoremerê dî. Eskeriya wî jî va nêzik dibe. Ya bi silametî ew e ku hê em sax, ew jî xort, wan bighînin miradê dilê wan.

Qêsim,

— Daxwaza we li ser serê min, qîza min va ye li vir û hûn dibînin xortekî min jî heye. Ku tu iznê bide min ez jî daxwaziyekê ji we dikim. Min bihişt ku çizikê we jî heye, xwedê wê bihêle. Ku min xelet fehmed kiribe giha ye mêra dî. Ez, ya rastî bêjim, ne hêza min dighê nextê ku ez bidim, mesrefan bikim û ne ya we. Paş vê yekê jî, heta ku ez

nexta kurê xwe dernexim, keça xwe jî nadim. Sebebên wê jî hûn dizanin. Lê ku hûn baş bibînin em bi vê yekê li hev werin. Win jî ji virde wî de xelas dibin û ez jî ji gûnihên lawê xwe derdikevim. Bi rastî ew çend salan mal bê kebanî bû, heta vê dawiyê Wesîla mezin bû û bû kebanîya malê. Vêca ku ew jî here û em bê kebanî bimînin bahdele ye. Tu zane dîya zarokan piştî min şikênand. Lê xwedê li me temaşekir, Wesîla zû fehmed kebanîtiye bû.

Peyva Qêsim, weke ku Mahmûd û Mêremê şaş kirin kêfa wan jî anî. Bi vê yekê pêwistiya next û ti mesrefan nedikir. Lê ku meriv rastî bêje, haja wan jî vî tiştî nebû. Di aliyê dinda jî Zekî, serê wî

di berde li xwe difikirî. Çi Zekî û Wesîla ev bir nedikirin. Gotina xwestina Wesîla jî ji aliyê pîrejînen gund hatibû guhên wan. Tiştê ku Zekî bir dikir ev bû, ku xelatek baş ji malzava bistîne. Ew jî di roja guheştina xwişkê wî de. Lê rewş hat guhertin. Xuya ye ku ew jî wê di nezîk de zewice.


Mahmûd

— Ku tu bi rîstî bixwaze, haja me ji vê daxwaza te nebû. Lê mademkî weha ye, va ye Mêremê jî li vir û em karê bersivê bidin.

Edî Mêremê dizanî ku ew li benda peyva wê ne.

— Bahwerke pêşneyara xwedê jê raziyo gelekî rind e. Madem xwedê weha emir da ye gereke ewha jî bibe.

Dûmahik li rûpelê 7'an e.



Mesela Kurdistanê di Pirtûka "Bineciên Cihanê" de


Jêmurê Xelil

Di yekîtî Sovîet her sal gelek pirtûkên Kurdîyê serhatiya û helbesta, ên sîasetî, zargotinê, wergerandinên ji efrandinên zimanên cihanê ye cihê - cihê ronahî dibînin. Herweha usa jî pirtûkên bi zimanên ermenî, rûsî, gurcîkî, azirî û zimanên mayîn derdikevin ser mesela Kurda û Kurdistanê.

Van axiriya alî weşanên Akadêmîa Sovîetistanê ye ulmaye înstîtûta êtnografiya da (miletzanî) ronahî dît pirtûka zanyarê zana Solomon Brûk bi sernivîsara "Bineciên cihanê". Vê pirtûkê da melûmetên nuh hene derheqa gelê Kurdada.

Para pirtûkê ye, ku tê navkirinê "Yekîtiya Komerên Sovîetîyê Sosîalîstî" tê gotinê, ku li Sovîetistanê bê jimara resmî (ofîsîal) 116 hezar Kurd hene. Ji wana 51 hezar Kurd Ermenîstana Sovîetîda dimînin, ku dikine 1,7 selefê hemû bineciên vê komerê. Lê li Gurcîstana Sovîetî 26 hezar Kurd hene. Em bêjin, ku Kurdên vira hîmlî li paytext - bajarê Tbilîsî dimînin. Kurdên Sovîetîstane ye mayîn komerên Asîa Navîn û Qazaxîstanê dimînin.

Em dixwezin we agahdar bikin ku pirtûkeke dinêda, kîjan li Moskov çap bûye bi navê "Yazî-



ya gela", xudanê wê - ulmdar A. Agaev dinivîse, wekî li Sovîetistanê 120 gela û neteva zêdetir dimînin. Ji kîjana 90 gel û neteve bineciên welê te qedîmîne, ku berê pêşda li ser axa Sovîetî mane. Wêda usa jî tê gotinê, ku 17 gelên yekîtî Sovîetî ji wan gelanin, ku gelê wanî hîmlî li welatên derreke dimînin. Yek ji wan gela gelên Kurde. Vê pirtûkêda tê kivşkirinê, ku eger bi jimarkirinê orte ji sala 1959-a hetanî sala 1970- î jimara bineciên yekîtî Sovîetî bi 15 selefa (ji 100- î bûne 115) zêde bûye, lê jimara Kurda bi 51 selefa (ji her 100 mirovî gihiştine 151 mirova) zide bûye. Ango, ji 120 gel û netevyên Sovîetîstanê, Kurd bi zêdebûna jimara bineciên xwe cîê pêşin digirin li yekîtî Sovîetî.

Niha em mêze bikin, çika pirtûka "Bineciên cihanê" ser mesela Kurdên cihanê çî dibêje. Ezê ser vê meselê hemî melûmetên

derheqa Kurdaye çûk û mezin yeko- yeko wergerînim Kurdî û raberî xwendevanêd kovara we bikim.

Para vê pirtûkê ye derheqa Turkîaêda ser mesela Kurda ev tiştên jêrin tene gotinê :

"Bi melûmetên resmî li Turkîaê 4 mîlion 100 hezar Kurd hene, ku dikine weke 10 selefên bineciên wî welatî (yanê ji 10 mirova 1 Kurde). Ew gotinên derheqa Turkîaêda, ku ew welatê awakîye di dereca miletîda, ne raste. Ew bona wê yekê dibêjin, ji ber ku nav serkanîd resmîda, herweka usa jî nava melûmetên derheqa jimarkirina bineciyada, ser mesela gelên ne tirk gotina nakin û derheqa jimara wan gelada em bes tenê hîm dibin li ser wan melûmetîya, ku ew gel bi çî zimanî gotina dikin û heşab dikin, ku jimara wana çiqase. Di qewlên derbazkirina sîaseta pîr sedsalaye assîmîlasyon (ya he landina gela nava xweda), ya komên Turkîaê ye serkarîkir, jimara gelên me tirk tê feşkirinê. Bili axa Kurdistanê, li ku Kurd dimînin, cîên Turkîaê ye mayîn pîranî tirkin.

Destpêka sedsala XX gelên Turkîaê ye ne tirk bi kêmanî dikirin 40 selefên bineciên wî welatî.

Tirk ji 2 komponêntên êtnîkîye hîmlî çê bûne : Ya ewilî, ew pêşda hatine ji qebîlên Türkên oguz ê koçer, ku mihacirî Anatoliaê (Asîa piçûk) bûne ji Asîa Navîn û Iranê di sedsala XI - XIII dema şerê di navbera tyurkên oguz û mongola. Ya dua, ewana çê bûne ji huruma, kurda,

ermenîya. gurca û gelên mayîn, ku berî tirkî li ser van erda mane.

Kurd li Turkîaê kompakt dijîn li perçên Turkîaê ye rohilate, başûr- rojhilatê û bakûr- rojhilatê. Ew war tê navkirinê Kurdistan. Kurd li wilayetên Hekarîê, Bitlîsê, Sîrtê, Mêrdînê, Urfayê, Wanê, Dîyarbekrê, Bingolê, Mûşê, Agriyê, Tuncelîyê dikine piraniya bi-ciya.

Li van dera binecîên gunda hemî Kurdin sedî sed, lê bajarada tevî Kurda usa jî hine tirk hene. Cî û warên Kurda usa jî para Turkîaê ye orteda jî hene : li Sivasê, Amasîaê, Enqerê, Qehreman Marasê û cîên dinê. Destpêka sedsala 20- î Kurda bi destî zorê ji Kurdistanê raqetandine van navçeyên tirkî, ku ewana zû nava gelê tirkîda bihelin, assîmîlyasîa bibin.

Kurd hîmlî bi zimanê xweyî dê- Kurdî xeberdidin, xwezma bi zaravê Kurmançî. Lê Kurdên Dêrsimê bi Kurmançîya zaza gotina dikin. Turkîaê da usa jî weke 70 hezar Kurdê êzdfî dijîn.

Turkîaê da ji 25 gelî zêdetir dimînin û jimara Kurda pey tirkîara jimara dudane û ji gelên Îranî tenê Kurd vira dijîn.

Ew para, ku derheqa dewleta Îranê dane, ser mesela Kurd û Kurdistanê çend melûmetî hene, ew jî evin :

Kurd bi jimara binecîên xwera 3 mîlîon 200 hezarin û pey fariza (ecema) û azirîya cîê 3- a digrin. Bifî wana vira lûr, bextîyar jî dimînin, ku ew jî bi fikra gelek ulmdara Kurdin. Jimara lûra û bextîyara du mîlîon 100 hezare.

Hezarsalîya 1- ê, ya berî dew-

rana me, yekfîên qebîlên Mîdîa- tene vî welatî, ku bi zimanê Îranîê (arî) dipeyîvîn. Sedsala 7- a, ya berî dewrana me, (an 2600 sal berê) gelê Mîdîa vira dewleteke pir mezin û zor çê dikin.

Îrana nihada weke 40 gelî dijîn û fariz diha hindikin, ne ku hemû gelên mayîn tevayî hildayî. Îrana dema şahda digotin, ku welate wande gelên mayîn namînin, bili fariza (ecema).

Îranê da Kurd hîmlî li Kurdistanê û Adirbêcana Roavaê dimînin. Weke 350 hezar Kurd jî li Xorasanê dimînin. Sedsala 17- a şah Abbas bi zorê Kurda dişîne Xorasanê, ku sînorê Îranê xwey bikin, biparêzin. Kurd hene usa jî li Têhranê, Qazvînê, Şîrazê, Lûristanê û Bêlûcîstanê.

Îranê da zimanê Kurdî gelekî belabûye. Kurd vira bi 2 zarava dipeyîvîn—Kurmançî û Soranî. Kurdên vira xweda hîmlî sunîne.

Li roava derîya (behr, dengz) Rêzaê da usa jî 30 hezar Kurdên êzdfî hene.

Niha em binhêzin ka para derheqa Îraqê da çi heye derheqa Kurda û welatê wanda :

Wê da em dixwînin, ku Îraqê da bi resmî 2 mîlîon 300 hezar Kurd hene, ku dikine weke 19 selefê (ji 100 mirovî- 19 Kurdin) binecîya wî welatê. Kurd piranî li 5 navçeyên Îraqê da dimînin. Ew ax tê navkirin Kurdistan. Bajarê Sulêmanî da 97 selefê binecîya Kurdin. Li navçeyên Dihokê, Kîrkûkê, Hewlêrê (Erbîl) weke 75 selefê binecîya Kurdin. Kurd herweha Bexdaê da jî hene. Dora Mûsilê pir Kurdên êzdfî hene. Er-

bîl navbenda Kurdistanê Iraçeyê avtonome..


Zimanên resmî dewleta Iraçê da erebî û Kurdîne. Kurd piranî bi zimanê xwe gotina dikin. Pir erebên, ku Kurdistanê da bi Kurdî jî rind zanin. Vira jimara Kurdên êzdfî 70 hezare û ewana dora çîyaê Sincarê (Şengalê) dijîn.

Li welatê Sûrîaê da weke 500 hezar Kurd hene, ji wana 10 hezar- Kurdên êzdfîne. Kurd piranî li navçeyên Helebê û Hesikê dimînin. Li Hesikê piranî (nîvê pir) Kurdin

Vê pirtûkê da em usa jî diwînin, ku cîhanê da 67 gel hene, ku jimara wana ji 10 mîlîonî derbaztir dibe. Yek ji wan gela gelê Kurde.

Vê pirtûkê da usa jî hatîye nivîsarê, ku li welatê Libnanê da 20 hezar Kurd hene, lê welatê Hordananê da jimara Kurda 3 hezare. Welatê Afganistanê da jî Kurd 10 hezarin.

Dêmek, bi jimarên resmî, li cîhanê weke 11 mîlîon Kurd hene. Ev jimara, hîlbet, resmîye û ne raste, ji ber ku li gelek welata jimara Kurda feş dikin, çelete û lema jî rastîe nikarin pê bihesin. Herwehabetenê jimara Kurdên Sovîetîstanê raste—116 hezar. Ê her tenê di pasportên Kurdên Sovîetîstanê da "Kurd" nivîsare, ji ber ku welatê meda wê derecê da û her derecada azayî û rastî heye. Em bêjin, ku 3 sala pêşda bi têlêvîsîona Moskow miqaledarê Sovîetîstanêyî navdar Alêk-sandr Bovîn gotareke xweye derheqa Kurda got, ku li cîhanê weke 20 mîlîon Kurd hene. Lê hejmareke Kovara Sovîetîyê "A-



BAVÊ MIN JI MINRE PIRTÛK Û PÊNÛS STEND, EZ Ê BICIM DIBISTANÊ.



DIBISTAN NUHA GELEK XWEŞ E.



EZ Û HEVALÊN XWE, EM Ê TIŞTÊN BAŞ HIN BÎBIN.



ROJA DIN

MAMOSTÊ BI ZIMANÊ MIN DERSÊ NADE.



EZ HIN NAVÊ PÊNÛS Û PIRTÛKÊ JI NIZANIM.



LÊ ÇEND HEVALÊN MIN HENE, EW PÊ ZANIN LEWRA TIRK IN



ÛDI EZ JI DÊ Û BAVÊ XWE HEZ NAKIM... MA BIRA EW JI TIRK BÛNA!!




LÊ EZ TENÊ NE KURD IM... LI DIBISTANÊ EM NOD KES KURD IN. TENÊ SISÊ TIRK IN...

MA ÇIMA MAMOSTÊ BI KURDÎ DERSÊ NADE ?...



QEY EM NE MIROV IN !.. MA GELO LI HEMI GUNDÊN KURDAN DIBISTAN WEHA NE ?

XACERÊZ



ÇEPERAST

- 1- Barana sıvık - Dawet
- 2- Pronavê keseminê pîrejumara yekemin - Lî Kurdistanê heremek.
- 3- Hêkên spiyan - Çançala dî serê teşiyê de.
- 4- Mehek - Lî Iranê heremek. Rojek (berepaş)

- 5- Loqme.
- 6- Xeberdan, galegal - Ne do û ne sibê.
- 7- Jîn dî çavên xwe didin.
- 8- Herî, erd, turab - Lî hember çekê berê hevalê mertal.
- 9- Jî derziyê mezintir e- Dezi, ben.
- 10- Jî dar an êzingê şil re têgotin - İsm - Lawireki kovi.

SEREJÊR

- 1- Merengoz - Germa rojê.
- 2- Hêvi
- 3- Lî ser şal tê lî xwe kîrîn - Mîrov pê porê xwe rast dîke
- 4- Fistan - Ne nêzik.
- 5- Rengdêrê işarki (berepaş). Ezber (berepaş)
- 6- Hêl, terf - Pirek.
- 7- Gotna neyinyê, ne erê.
- 8- Ne iro û ne sibe - Şubhe (Berepaş)
- 9- Kurtenîvisa Iranê - Lî ali Hekariyê jî zewacê re tê gotin (berepaş) - Pêxemberek.
- 10- Lî binê İngê hespan dixin (berepaş)
- 11- Ne BIRIN - Çemê mezin - Pronavê keseminê duwem.
- 12- Lawîrek bî çalîk e û pîr gran dîmeş - Nexweş, çels

Dûmahika "Mesela Kurdistanê...."

sîa û Afrîka îro" nivîsîbû. ku 40 selefê binecîên Turkîaê Kurdin.

Ji jimarkirina xûyanîye, ku Kurdên Sovîetistanê bi jimara binecîên xwe dikine nivê selefê (0,5%) Kurdên cîhanê. Lê bona Kurdên welatê sosîalist her mecal û mikanên pêşketinê hene, ku her Kurdekî Kurdistanê û herweha Kurdên welatên mayîn dikarin xwezîya xwe me bînin.

Ronahîdîtina vê pirtûkê usa jî dîharbûneke çencîye hindava Kurdên cîhanêda, wêda tê ber çava serdestîya Kurdên Sovîetis-

tanê himberî Kurdên cîhanêye mayîn. U ev pêşketin qeydê me-yî sosîalîstîfê daye me. Ev pêşketin welatên mayînda jî bo Kurda tune, çinkî qeydê wana ne ê sosîalîstîfê ye û pîranî dji Kurdaye

Ev pirtûka "Binecîên cîhanê", mirovekî me Kurd nivîsîye, lê çawa ew, usa jî pîr ulmdar, xwezma rohilatzanê Sovîet, rind haj jî Kurda hene, ji ber ku Kurd zanî bal me pîr pêşketîye.

Bi serî vê pirtûka delal bi mîlîona mirovên Sovîetistanê û welatên mayîn nasîya xwe didine dereceke Kurda û Kurdistanê.

M. Lewendî

BERSIVA HEJMARA 5'AN

1	K	O	V	A	N	K	E	R	A	N	E		
2	O	L	R	A	B					K	E	Y	
3	L	E	K			E		M	U		O	L	
4	T			L	A	L		O	N		O		
5			X		S	E	X	S	E	F	I	D	
6			L	I	B				A	R	S	I	M
7	H	E	R	E	D	O	T		Z	A	N	A	
8		B	A	L	A	M		M	A		E	S	
9	B	A	R	A	N		X	I	N	T			
10	A	T		S	I	N		R	I		T	I	

NAMÊN XWENDEVANAN

Brayên Hêja,

Bersîva name ya min ku, we ji min re şandibû, min wegirt. Bi rastî ez gelekî dilxweş û sermest bûm.

Rast e; di tekoşîna azadiya gelê xwe de, em bi her awayî hewcedarên hev in. Di her awayî de diyê em bi biratî destên xwe bidin hev, bêî ku em xwe di serhev re bigrin, li ser rêçek rast û bi ilmekî zanyarî xwe bavêjin çada xebat û tekoşînê, da ku welatê me zû serbixwe û gelên me zû azad dibin.

Weke ku hûn ji dixwazin, ez ji dixwazim ku, têkiliyên me berdewam bin. Ez dixwazim bi her awayî kovara Berbangê dewlemend bikim. Wê ev ji bo min serxwegirtiyeke mezin be.

Hûn dikarin her car ji min re deh, panzdeh an bîst kovaran biînin. Li gorkêsa xwe ez dê wan belav bikim û bifroşim. Ji ber ku ev kovara Federasyona komelên Kurdistanê tevî ye, ango ne kovara komelekê an komikekê ye. Di her nameya xwe da ez dê helbestan bişînim.

Bi silavên biratî

Birîndar

Hevalên Hêja,

Ez we bi navê endamên Komela Kurdên Australia ji bo weşandina kovara BERBANG ji dil pîroz dikim. Merov dikane bi kovara we serê xwe rake. Derxistina kovarekî bi zmanê Kurdî rojên îroj zor zehmete, xasme ji bo sedemên aborî. Mixabin ku pir ji mirovên Kurd tim bi gili û gazincin, lê ez hêvîdarim ku hûn guh nedin peyvên vala û kovara xwe pêşve bibin.

Me perên abona 10 heban ji we re li ser navê Federasyona we ber çend heftan şandibûn. Em hevidarin we ew girtibin. Ger hûn ji me hîn alikariya aborî hêvî dikin, xeberê bidin me; ta ji dest me bê der em dibin alîkar.

Ez çend nivîsên xwe ji we re dişînim; ger hûn wan li yaqî BERBANG dibînin, hûn dikanin wan gor xastina xwe çapkin (ez heqê guhertinê ji didim we). Lê ger ew ne li yaq bin, hûn dikanin wan rêkin.

Hejmarên BERBANG 2 û 3 hefta derbas bû gihîştin me, zor spas.

Silavên biratî û Kurdayetî.

Şahîn

Hevalên Delal,

Lî vîr 2-3 heftan berê, min kovara we Berbang dit û pîr dilxweş bûm, serê min gihîşt ezmana. Ji bo ku kovara we bi hemû zmanê dayik û bav û kalê me hatiye nivîsandin.

Brayên hêja, welatki weka Austuralya welatki gelek dîr e, pêwîstên me kurdan li kovarek weka Berbangê heye, ji bo pêşvebirina zmanê dayika me. Dij-minên xwinmij zmanê me kede-xe kirine û pîr ji me kurdan asimile bûne. Em derin malê hevalên me yê kurd ku bi zmanê xwe bipeyivin, bes ji sedî nod bi mera zmanê xerib, bi zmanê Tirkî dipeyivin. Ji bo wi hawayî hêviya min ji we ku hûn hertim kovara Berbang ji mûra bişînin. Yani ez dixwazim bîbim endamê sala-wexti ya Berbangê. Xerca saleki çiqase ji mûra binivîsin ez ê ji we ra rêkim. Hûn kovara Berbangê ji komela mera dişînin, bes mala min ji hevalan dîre û ji mûra naminê.

Pîr pîr hêvi dikim, min têkin endamê Berbangê.

Slavên biratî û şoreşgeri ji we-ra dikim û serfiraziya we dixwazim

Rîzê Gur

Ji hevalê BERBANG'RA

Min BERBANG xwend û xweş dît, lê hevalekî hêjîya li Alemanîya dît, ji mûra got, "tu ji BERBANG' ra helbestê xwe bişîne û bira di BERBANG'ê da veşînin.

Ez Feqîr Ahmed xwedîyê (Dîwana - Reş), li we hevalan pîr slav dikim û ez dixwazim abone bîbim ku em hevdu rexnekin, seba bingeha gelê Kurdistanê bi rêça çîni hîn jîr û mezin bikin.

Lê ez di vê namê de helbesteki xwe dişînim û navê helbestê " Herdu Hostê cihan ê."

Silavên dilgerm û bimînin bi şadî Xwedîyê " Dîwana Reş" Feqîr Ahmed

INSTITUY KURDI LE FRANSA !

ÇANDEK DI BIN XETERÊ DE YE, DI HEWARA WÊ DE WERE !

ÇANDA HEZAR SALÎ YA 20 MILYON KURDÎ LI
ROJHELATA NÊZİK DI BIN XETERA MIRINÊ DE YE

Bî raguhastin û hilweşandineke sistematîk ku ji aliyê dewletên ku netewa Kurd parçe kirine têt kîrîn; ev parçê bêhempa yê jêmayeya (miras) çanda dinê di bin riskê ku ji bin ve winda bibe de ye. Sen'atkar, nivîskar, dirokvan û zîmanzanên Kurd ên ku bi xwe ji di bin vê xeterê de ne û niha raguhesti (çêli bûn, dîrxistin, surgûn) Ewrûpayê bune, dîzanin dema ku gelekî ji çanda xwe bêpar bêt hiştin ewê gav-bî-gav ber bi mirinê ve biçê; ji lewre ji li dijî vê jenosida çandî, ya ku rêxistinên navnetewî (UNO, UNESCO, hwd.) li hember bêdeng û bêbîzav diminin, çendekî berê instituyêke Kurdi damezrandin. Gelê Kurd, bi hebûna xwe di bin tehdîdê de ye. Ji ber vê yekê ji hewcedarê alîkariya gelên din e. Hekariya we ya pê re grîng û pêwîst e.



ZIMANEKÎ QEDEXE

Ev pirtûka ku hatiye nivîsandin, berî niha bi çendekî li Tirkîyê hat qedexe kirin. Nivîskarê wê di dû gelek salên girtîgehê û mahkumiyetê re, diva bû raguhestîni Ewrûpayê bibe. Enîvîsa bi sedan ronakbirên din ên Kurd ji her weha ye.

Ev dewleta Ewrûpî, ku endamê NATO û KONSEYA Ewrûpayê ye ji: di demeke wulo de ku heymana XX' an nêzîkî dawîya xwe dibe, çarçeka nufûsa xwe ji mafên çandî yê herî bîngêhin bêpar dihêle û bêî ku tu hesab jê bêtîrîn pîrsin vê yekê her didomîne.

S.O.S. A CULTURE IN DANGER

The millenary culture of the 20 million Kurds in the Near East is in danger of dying.

Banished, suffering a systematic destruction from the States which have divided the Kurdish nation, this unique part of the world's cultural heritage thus incurs the risk of disappearing for ever. Confronted with this peril, the Kurdish artists, writers, historians and linguists now living in exile in Europe, aware that a people deprived of its culture is doomed to die slowly, have just created a Kurdish Institute to prevent the genocide of their culture, Faced with the silence and inactivity of international organizations (UNO, UNESCO, etc.), the Kurdish people whose very existence is threatened, needs the help of other people. Your cooperation is vital.



A BANNED LANGUAGE
The spelling book is presently banned in Turkey. Its author, after several years of imprisonment and prosecution, had to exile in Europe. As did hundreds of other Kurdish intellectuals.
As the XXth century draws to an end, this European State, a member of NATO and the European Council, continues with impunity to deprive one fourth of its population of its most essential cultural rights.

- I wish to participate in the action of rescuing the Kurdish culture. I send a check for FF. for account of the Institut kurde.
- I wish to receive a documentation and information bulletin from the Institut kurde.

INSTITUT KURDE DE PARIS
Boite Postale 66 - 75662 PARIS CEDEX 14
CCP 573895 E PARIS

- Dixwazim beşdari aksiyona rizgar kirina çanda Kurdi bibim. Ez ji hesabê Institutyê re çeki bi...FFi dîşînim.
- Dixwazim dokumentasyon û bultena informasyonê, ya Institutya Kurdi wergrîm.